



Litenîsta Stenbolê jiyana kurdan

Z

arokên
Ayazma,

bêyi nîşana
serkeftinê
wêneyan
nakışînin.

Her çiqas me ji
bo wêneyên
cihêreg me zor
daye wan ku
tiliyän deynin, lê
em bi ser
neketin.

Her wiha tevî ku
Ayazma di
tenîsta Stenbolê
de ye jî kesên ku
navê Taksîmê
nebihîstine, gelek
in.

RÜPEL 3

Heppeyma Felix Martî:

Heke nasnavê kurdan neyê nasîn li
Ewrûpayê demokrasî pêk nayê

Rüpel 15

Gerdevan:

Dewleta tîrk me ji
xwe re dike mertal

Rüpel 15

Amed Tigris:


Berjewendiyê neteweyî
û yên şexsî

Rüpel 7



4

Çiya Mazî - Chan Roj: Welatê 'ci min jê' Mêrdin



6

Giyasettin Şehir: Welatê min ê di bin postalan de



12

Aram D. : Her şer e

Jî Xwendevanan

KIRIKKALE amojgariyek e ji bo dewleta tirk hilteqandina kargeha 'Kirikkale' yek e ji darbeyen heri mezin bo dewleta tirk. Ev destkeftin girîng bû ji bo gerilayen ARGK'ê ku ev rûdan ji laye wan ve hatibû lidarxistin. Vê çendê çapemeniya: cihanî demek direjî mijûl kir, ji ber ku ev çend dewleta tirk perdepoş dikir û vedisart û di da xuyakirin. Ev teqin ji encameke tekniki çebûye, pişti çapemeniyê girîngî daye babetê xuya bû ku ev amojgariyeke bo dewleta tirk, her wekî ku bi daxuyaniyekî hattie xuyakirin ji laye yek ji berpirsiyaren ERNK'ê yên Hollanda ve. Ev berpirse ERNK dibêje: "Rast e ev rûdan ji laye gerilayen ARGK'ê ve hattie lidarxistin, ji ber ku jimarek pir ji teqemeni di vê kargehe da dihate dirustkirin û berev Kurdistanê dibirin û li hember gelê kurd dihate bikaranîn. Heger ku dewleta tirk vê dagirkeriya xwe li ser Kurdistanê nede rawestandin dê ser hê germitir bibe li metropolên Tirkîyeyê û dê dewleta tirk darbeyen mezintir bixwe."

FERHAN ZEBARİ

HEYA ku ji destê me tê em rojnameyê teqîb dikin.

Li Agiriyê tunebûna nûnerekî û tenê li yek bayî belavbûna rojnameyê dike ku em negihêjin we û rojnameyê. Lî belê em daxwazin her dem bi we re di diyalogê de bin. Daxwaziya me ji we, hûn ferhengokê hinêki firehtir bikin û bêhtir giranî bidin nivisen dîroka. Di xebatê we de serketin.

FUAT ÖZDEMİR



Xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdi

SAMI TAN

Di warê xwendin û nivîsandina bi zimanê zîmkâkî de kurd di. Kîjan astê de ne? Gelek kes li ser vê pîrsê nîr-xandinê cur bi cur dikin. Piraniya van nîr-xandinan li gorî pîvanê zanistî nehatine kirin, lewre kesî tu lêkolîn li ser vê mijarê nekirine.

Xwendin û nivîsandin li parçeyen Kurdistanê yên cuda ji hev cihê ye. Li başûrê Kurdistanê ji ber ku tu carî qede-xe li ser zimanê kurdî tunebûye, xwendin û nivîsandina bi zimanê zîmkâkî ji di asteke bilind de ye. Li Başûrê Biçük tevî qedexebûnê ji şop û rîça rewşenbîrên ku Hawar, Jîna Nû û Ronahî derxistine li ser jiyana civakê maye. Gelek mirovên rewşenbîr ku bi zimanê xwe xebatê dikin, pirtûkan bi awayekî nehê-nî çap dikin, hene. Lî bandora zimanê erebî ji li ser gel çebûye.

Li Rojhilat ji ber bandora Başûr û xurtbûna hest neteweyî, xwendin û nivîsandina bi zimanê zîmkâkî kêm be ji, hebûye. Li aliyê din dewletê ji rasterast hebûn û zimanê kurdî qedexe nekirine, lewre ji derfet çebûne ji bo ku hinek kovarê weki Surwe û Awêne derkevin, hinek pirtûk bi zimanê kurdî çap bibin. Her wiha gelek weşanên ku bi zimanê kurdî derketin ji ketine destê rewşenbîr û xwendeyen Rojhilat.

Cihêkî ku lê derfeta xwendin û nivîsandina kurdî hebûye ji, komarêñ cur bi cur ên Sovyetistanê bûne. Li van deran kurdan li dibistanan derfeta perwerde-

hiya bi zimanê xwe bi dest xistine. Hînek xebatêñ hêja li ser ziman û canda kurdî hatine kirin. Bi taybetî xebatê berhevkariyê hêjayî pesnê ne. Di warê dîroka Kurdistanê de ji zanyarêñ hêja ji nav kurdêñ sovyetê gihîstine. Lî xebatê li ser zimêñ teng mane, ji ber ku lêkolîneren kurdêñ sovyetê bi ekola Hawarî re têkiliyên xurt nedanîne, li ser devokê xwe rîziman û rastnîsek ava kirine û bûne ekoleke serbixwe. Hê ji hinek weşan hene ku di bin bandora vê ekolê de mane. Ew ji dibe sedema hinek dubendiyan di navbera weşanen kurdî de.

Dema mirov were Bakur rewş bi temamî diguhere. Li vî parçeyî her tim qedexeyeke tund li ser zimanê kurdî hebûye û ew ji büye sedem ku bisaftin (asimîfasyon) zêdetir bandorê li gelê kurd bike. Tişte balkêş ew e ku komara tirk karibûye têkiliya kurdêñ Başûrê Biçük û Bakur qut bike û nehiştiye ku ekola Hawarî bandora xwe li gel û rewşenbîrên bakurî bike. Qet nebe mirov dikare bîbêje bandora wê ekolê geleki bi sînor maye. Hejmareke biçûk ên rewşenbîr karibûne bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin. Lî hejmareke mezin ji digel ku welatparêz bûne ji, xebata xwe bi zimanê serdestan kirine. Di vî warî de bandora çepgirêñ tirk ji pir e. Ciwanêñ kurd ku bi bandora çepgirêñ tirk bûne sosyalist û pişte ji bûne welatparêz li ser xwendin û nivîsandina bi zi-

manê xwe ranewestîne. Xebatê xwe yên siyasi bi zimanê tirkî meşandine. Di ser de ji ew rewşa xwe teorîze kirine, dema rexne li wan hatine girtin, bera-viyya xwe bi vî awayî kirine: "Ziman ne armanc e, hacet e. Mirov xwe bi kîjan zimanî xwe baştır ifade dike, divê bi wî zimanî xebatê bike." Ev bîr û ray hê ji dîna tevgera kurd de xurt e.

Pişti tevgera azadiyê bi geşbûna hesten neteweyî re hewlén ji bo xwendin û nivîsandinê ji zêde bûn. Lî hê ji gelek mirovên ku jiyana xwe di nava çalakiyên tevgera kurd de derbas kirine û amade ne ku di vê rî canê xwe bidin, nizanîn bi zimanê xwe çend rîzan bini-vîsin. Tişte balkêş ev e ku gelek ji wan doza Kurdistaneke serbixwe û yekgirtî dîkin.

Li Bakur dema mirov bala xwe dide zimanê hinek nivîskarêñ kurd ji, tê dîtin ku xwendin û nivîsandin di asteke geleki nizim de ye. Haya gelek nivîskarjan ji rîz û rîcikên bingehîn û rastnîvis û rîzmanê kurdî nîn e. Mirovên me di saz-kirin û honandina bir û ramanê xwe de ji zêde bi pêş neketine, hevok li nav guhê hev dikevin, paragraf qet nîn in, an ji li gorî dilê nivîskar hatine çekirin.

Ew tiştekî xwezayî ye, lewre mirovan hê tiştek' nexwendinge, dest bi nivîskariyê dikin, hinek ji wan ji weşanen kurdî doza quncikan dikin. Xuya yê ku divê em xwe ji vê rewşê riha (rizgar) bikin, dev ji xizmeta ji bo ziman û canda xelkê berdin, li ziman û canda xwe vegeerin. Niha derfetên hînbûna zimanê zîmkâkî û naskirina canda kurdî ji berê geleki zêdetir in, bês bila daxwaz û xebat hebe. Gelek neteweyen din ji di vê qonaxê re derbas bûn, em hinekî dereng ji mabin, divê em ji bi lez û bez di vê qonaxê re derbas bibin.

Bayê 29'an kulîlka

OSMAN ÜZÜM

Bihar bi gerîla xweş dibe. Lewre çawa kesê bindest diparêze, bi wî awayî xwezayê ji diparêze. Ji ber ku jiyana mirovatiyê bi xwezayê ges dibe. Xweza bingeha hebûna mirovan e. Li welatê rojî li ser mirovatiyê her dem ewrekî tarî hebû. Ew ewr bê ba û bê baran bû. Bê tav bû û di cihê xwe de sekînî mabû. Ji ber vê yekê tovê ku hatibû çandin ji, şîn nedibû. Ji bo ku ew ewrê tarî rabe, bayekî pir bi quwet û gur lazim bû. Lewre di Kurdistanê de 28 ba rabûbûn lê geweta wan têra wan ewan tarî nekiribû.

Ev bayê ku iro rabûye yê 29'an e. Di tarîfiyê de serî rakir, mîna birûskan û pir bi şid hat li wan ewan xist û ew ji hev xistin. Bi lêxistinê re, rûyê tariyê qetand û şewqa ronahiyê vekir. Edî bayekî bi baran, ewrekî bi rahm, taveke germ da ser axa welatê rojê. Tovê ku li welatê rojê hatibû çandin roj bi roj rehêñ xwe berdi dan bin erdê û şaxê xwe da ser rûyê axê û gihîste hevûdin û belav bû li ser rûyê axê. Ew şax çiqas rûyê erdê dixemilînîn, ew qas ji bayê paqî li ser rûyê cihanê xweşiyê belav dike. Ev ji dibe sedema xweşikbûna xwezayê. Xweşikbûna xwezayê ji mirovan gelekî dike bin bandora xwe. Evi ji dijî dîroka mirov azadî û serbîsî dîparêze. Da ku mîna wê darê bi serbestî were jiyankirin. Lewre li devera ku lê jiyan tunebe li wir

Bayê 29'an edî ne wek bayê din e. Lewra ev ba bi bayê baskêñ teyrê baz çê bûye. Ev bayê 29'an hişt ku ewrêñ zelal û paqî rîşen xwe mîna dara biyê berde tarîbûn heye.

Lî belê, di dîroka mirovatiyê de çiqas tarîbûn kûr bûye, ewqas ji ronahî zû derketiye. Pişti tariyê ronahî çedîbe, pişti rojîn sar rojîn germ çedîbin û dîlxwesiye bi xwe re tînîn. Çaxê dibêjin bihar, mirov zane ku ew demsala berxwedan û azadiyê ye. Xweşikbûna biharê rengê twe yê şerîn, mîna ronahîya tavê li seranserê welatê rojê hattie belavkirin. Ew her mirovî ji xewa giran hişyar dike. Şervanîn azadiyê ji bi çekîn xwe dixemilîn û dîbin notirvanê welatê xwe. Mîna teyrê baz êrişan dîbin ser neyareh hov û har. Ji ber ku neyareh biharê welatê rojê bi jehra xwe di de hiskirin. Zaroyen medan ji, li dijî vê sitemkariyê, xwînê dirêjin û pê çîçekîn biharê av didin.

Gel ji hev belav bûbûn, zarokên medan ew gihandîn hev, bi hev ve dan girêdan. Edî xort û keç bi bir û bawerî di vê riye de dimeşin, bi milyonat. Yen weki hevalê Mazlum, Egid, Hayri, Zekiya,


Rewşen, Zilan şexsiyeta xwe kirin bombeaya atomê, bûn bizotê agir û bi ser rûyê dijmin de hatin teqandin. Bi teqandinâ wan re, ronahîya biharê li deşt û zozana hate belavkirin û cihan ji bi ronahîye re hat xemilandin. Ev bihara medan e. U ev şerî berxwedanê ji roj bi roj, hêviya gelan xurt dike. Bi vê re ji xemla xwe azadî dike.

Bayê 29'an edî ne wek bayê din e. Lewra ev ba bi bayê baskêñ teyrê baz çê bûye. Ev bayê 29'an hişt ku ewrêñ zelal û paqî rîşen xwe mîna dara biyê berde tarîbûn heye. Lî belê, di dîroka mirovatiyê de çiqas tarîbûn kûr bûye, ewqas ji ronahî zû derketiye. Pişti tariyê ronahî çedîbe, pişti rojîn sar rojîn germ çedîbin û dîlxwesiye bi xwe re tînîn. Çaxê dibêjin bihar, mirov zane ku ew demsala berxwedan û azadiyê ye. Xweşikbûna biharê rengê twe yê şerîn, mîna ronahîya tavê li seranserê welatê rojê hattie belavkirin. Ew her mirovî ji xewa giran hişyar dike. Şervanîn azadiyê ji bi çekîn xwe dixemilîn û dîbin notirvanê welatê xwe. Mîna teyrê baz êrişan dîbin ser neyareh hov û har. Ji ber ku neyareh biharê welatê rojê bi jehra xwe di de hiskirin. Zaroyen medan ji, li dijî vê sitemkariyê, xwînê dirêjin û pê çîçekîn biharê av didin. Ev ji bi destê teyrê baz tê parastin, zêr û zelal diherikin, li ser mîrgan, zeviyan û deştan, hemû ûr paqî dîbin. Ev ji bi teyrê baz û biharê ye.

Edî nema kes yan ji marêñ kor dikarin biharên me bidin hiskirin. Ji ber ku teyrê baz bi roj û şev welatê rojê diparêzin. Parastina welatê rojê dike parastina mirovatiyê. Ji ber ku bayê 29'an bihara zêr û zivî û bi xwînê hattie nivîsandin, ne xera dîbe ne ji, winda dîbe



ARTESA Rizgariya Gelê Kurdistanê ARGK'ê banga teslimbûnê li Partî Demokrata Kurdistan PDK'ê kir. Li gorî daxuyaniyên çavkaniyên gerîla, PDK'yiyen ku xwe teslim bikin wê ewlekariya can û malê wan di bin parêziya gerîlayan de be. Fermandarê PDK'ê ên payebilind, di şer de yek bi yek tênu kuştin. Tê gotin ku ew yek dibe sedema belavbûn û şikeştina héza PDK'ê ya di şer de. Di şerên dawîn de cîgirê fermandarekî wî yê alayê jî hate kuştin. Her wiha di encama çalakiyên ARGK'ê û Hîzbi Sosyalîst Demokratî Kurdistan (HSDK) de li herêmén Qesrê û Çomanê 30 PDK'yî hatin kuştin. Her wiha li herêmén din jî cerd û êrişen gerîla li ser baregehê PDK'ê zêde dibin



SAR Suna Aras, Parêzer Gûlizar Tuncer, Birgül Kutay û Munewer Îtemûr ku ji bo komcivîna windahiyen de mijûya 11-14 têrmehê de çavdêriyên xwe anîn zimên. Di civîna çapemeniyê de ku li bûrova Stenbolê ya Komîteya Navneteweyî ya Têkoşîna ji bo Windahiyan ICAD'ê çêbû, Aras, Tuncer, Kutay û Îtemûr dane zanîn ku komcivîn par li Stenbolê, îsal jî li Kolombiyâye li Bagotayê çêbûye û 158 kes jî besdar bûne. Her wiha di civîne de hate xwesin ku têkoşîna ku li hemberî windakirina binçaviyan tê meşandin, divê navneteweyî be. Weki tê zanîn sala par malbatêni windahiyan bi komcivînekê têkoşîna xwe gihandibûn qada navneteweyî.

NÛÇE

Li teniştâ Stenbolê jiyana kurdan

Zarokên Ayazma, bêyî nîşana serkeftinê wêneyan nakişin. Her çiqas me ji bo wêneyen cihêreg zor daye wan ku tiliyan deynin, lê em bi ser neketin. Her wiha tevî ku Ayazma di teniştâ Stenbolê de ye jî kesen ku navê Taksîmê nebihîstine, gelek in.

Dewleta tirk ji têkoşînen berê yên ji bo rizgariya netewe-yî hîni gelek tiştan bûye. Ji van yek jî wekî şerê Vietnamê koçberkirin û valakirina gundan e. İHD di 5'ê tirmeha 1997'an de di brîfinga xwe ya der barê mafêni mirovan de "koçberiya kurdan" wekî koçberiya herî mezîn a sedsala bîstan bi nav kîribû. Tiştê diyar ev e ku êdî kurdi metropolîn Tırkiyeyê di "giravê candî" de dijîn.

Roja 22'ye tirmehê me rahiş teyb û makîneya xwe û me berê xwe da gundê Ayazmeyê ku girêdayî İkitelliya Stenbolê ye. Berî ku em herin Ayazmayê, me ji GÖÇ-DER'ê li ser rewşa koçberen Stenbolê agahî standin. Berpirsiyaren GÖÇ-DER'ê dan zanîn ku digel rewşa kambax û xerab koçber derd û eşen xwe ji ber quretiya (gurur) feodal baş nayînin ziman. Her wiha bal kişandin ser rewşa Kîlyosê û gotin ku ji ber çewsandin û zordariya dewletê koçberen Kîlyosê neçar mane ku vegeerin bajarîn wekî Amed û Mêrdînê. Koçberen me ji televizyon û rojnamegeran qebûl nakin. Di heman demê de berpirsiyaren GÖÇ-DER'ê diyar kirin ku gava ku

doxtor diçin taxên koçberan bawer nañin ku ew kes doxtor in û dibêjin: "Em kî ne ku doxtor werin ber pîyên me."

Gava ku mirov gundê Ayazma dibînê, baweriya xwe pê nayîne ku di teniştâ Stenbolê de ye. Niştecihîn Ayazma li hemberî rojnameger û televizyonan pir bi pêşdaraz in. Berî ku em bikevin nav gund, em li kal û pîrikekê rast hatin, wan ji nav molozan hesin derdixistin. Wexta ku me ji bo kişandina wêneyan hewl da xwe, pîrika heftê salî em dan ber keviran, pişti ku me got 'Em ji rojnameyeke kurdî têñ' hêrsa wê hinekî daket, lê dîsa jî me bi zorê wêneyen wê kişandin. Pişti vê yekê em li ser kaniya gund, rastî hêrs û reaksiyona keç û jînîn ku kîncan dişon, hatin. Li vir ji pişti ku me got: "Em ji rojnameyeke kurdî têñ", me bi zorê ji wan hinek agahî standin.

Vegera gundan derew e

Niştecihîn gund bi piranî rewşa rasîn nedianîn ziman, zarakan jî gava ku bi me re diaxivîn navê xwe yê rast nedigotin. Kêm kesan bersiva pirsên me dan. Pişti hin agahîyan, diyar bû ku kesen ku dibêjin: "Em bi xwe hatine Stenbolê" jî hatine koçberkirin. Li ser pîrsa me hat ragihandin ku digel daxuyaniyên dewletê, vegera gun-dan ne mimkûn e. Berevajî vê yekê hê jî koçber têñ. Dîsa gundiyan eşkere kîrin ku, dewlet bi zanebûn pêwistiyen gund peyda nake û bi vî awayî ceza li wan dibire. Ayazma bê ava dijî. Niha gund ava xwe ji kaniya dûr



rî gund peyda dike.

Zozan Sokak

Li Ayazma, ji bo nîşandana hişyar-bûna neteweyî mînakên baş hene. Niştecihîn Ayazma navê kurdî li kolanên xwe kirine. Li gund navê kolaneke Zozan Sokak e. Tiştê balkêş digel ewqas kambaxî û dijwariyê, gel gelekkî dilges e. Bi taybetî encamên dagirkirina başûrê Kurdistanê bandorêne gelekkî efenî li gel kirine. Gel bêyî pirskirina me, ji bo daxistina helikopteran dilşahiya xwe anîn zimên û gotin: "Îmkanên wan ji me gelekkî zêdetir bûn, lê em bi ser ketin. Em ji dilşadiyê nizanîn ci bîbêjin.

Taksîm ci ye?

Zarokên Ayazma, bêyî nîşana serkeftinê wêneyan nakişin. Her çiqas ji bo wêneyen cihêreg me zor daye wan ku tiliyan deynin, lê em bi ser neketin. Her wiha tevî ku Ayazma di teniştâ Stenbolê de ye jî kesen ku navê Taksîmê nebihîstine, gelek in. Ji zarokan daxwaza lawikan bisiklet, a keçan jî bûkek e.

Tesîra MED-TV

Her çiqas li metrepolan kurd asîmîle dîbin, ji aliyekevî ve jî ji bo yekîtiya zimanê kurdî îmkan jî peyda bûne. Li deveren wisa ji her deverê Kurdistanê mirov bi hev re têkiliyan datin. Pişti avabûna MED-TV'ye ev pêşketin bi lezter dixebe. Bo nimûne mirovên ku ne xwende ne ji xweber qala huner-

mendê kurd Ciwan Haco kirin û ew wekî "Tarkanê kurdan" bi nav kirin.

Di axaftina gundiyan de peyvîn nû jî bala mirqv dikişandin, lê dîsa jî xwendîderketina li zimên têr nake. Ev yek bi piranî ji bo zarokan derbas dibe. Xuya ye ku divê sazî û rêxistinê kurdan li ser perwerdehiya koçberen kurd, bi berfirehî bisekinin. Bi taybetî ji bo zarokên ku hîni xwendin û nîvîsandinê nebûne, divê kampanya bêñ lidarxistin, ji ber ku bingeha pêşeroja Kurdistanê bi asîmîlebûna qels û lawaz dibe.

Mafyaya araziyê

Belê, digel zilma dewletê û koçberiye mafyaya araziyan jî li serê kurdan bûye bela. Niştecihîn gundê Ayazmeyê gazzinên xwe dikin û dibêjin, "Derd û kulên me ne bes in, li vê çola hanê ev mafyaya araziyan erdan bi perreyan difiroşe kesen koçber ên feqîr, bê mal û milk." Ev mafyaya araziyan li gorî niştecihîn Ayazmeyê bi awayekî eşirkî vê xebatê dikin û xwe bi welat-parêziyê jî didin naskirin. Têkiliya blediyeyê û polisan jî li gorî agahîyan bi vê eşîra ku xwe bi navê welatparêziyê dide naskirin re heye.

Bi vê mebestê gundê Ayazma, bûye du bes. Li cihêñ bilind, ev kesen mafyaya araziyan rûdinê, li xwarê jî yê feqîr û kedkar bi cih bûne.

MAZLUM DOĞAN

AZAD ALTUN



Welatê 'çi min jê' Mêrdîn

Di bakurê Kurdistanê de Mêrdîn cihekî bi taybet e. Vê taybetiya wê di pêvajoya şoreşê de jî xwe tim daye xuyakirin.

Ji aliyê erdnigarî (cografi) ve Mêrdîn cihekî stratejîk e. Li serê kolikeke bilind ava bûye. Li serê vî kolikê kela-yeke mezin heye ku ji bo parastina ji cerdên biyanan berî zayinê ava bûye. Li aliyê başûr û rojavayê Mêrdînê beriyek gelek fireh heye. Di dîrokê de serdestan gelek caran ew dane desten hev. Wekî tê zanîn gelê herî kevn li vê derê gelê asûrî (suryanî) ye. Nîşanên gelê asûrî û şopên wan li her devera Mêrdîn xuya ne.


Di dema osmanîyan de û berî wan jî erebêni Iraqê û Sûriyeyê hatine li vê derê bi cih bûne. Van salêni dawîn jî kurd hatine bajêr. Bi taybetî di pêvajoya şoreşê de kurdan ji derdorêne wê koç kirene û li Mêrdînê bi dehan tax ava kirine. Li aliyekî din, bi sedan karmendêne tirk jî li vê derê hene û hinek çeçenê qaf-qasî jî li Qoserê binecîh in, ew kes hînî kurdî jî bûne.

Ji bo Mêrdîn ev gotin tê gotin: "Bi şev gerdane bi roj goristan e" Ev gotin bi taybetî jî bo navenda Mêrdînê ye. Di axînên kesen jî başûrê biçük de jî Mêrdîn simbol e.

Heta pêvajoya şer helandineke hov li ser gelan hatiye meşandin. Bi piranî gelên wekî suryanî û keldanî ji neçarî ji vê derê koç kirine. Beriya bîst salan jî bi deh hezaran û hîn pirtir hebûn, lê a niha bi dehan û sedan têne jimartin. Di dîroka komarâ tirk de gelên ereb û kurd jî leqayî politikayêni pişavtinê (asîmîlasyon) hatine. Di pêvajoya şer de jî komarê navenda Mêrdînê ji xwe re wekî bîryargeh dîtiye. Sedema vê rewşê di rastiya ereb û kurdêni li bajêr û rastiya Qoserê (Kiziltepe) de veşarî ye.

Erebêni navendê, li ser navê rebîtiyê tu tiştek di kesayetiya xwe de nehe-wandine. Ji bo wan erebtî tenê axaftina bi erebî ye. Lê nijadperestî pir e. Gel-perwerî, neteweperwerî ji bo wan xerîb in. Ji nîvî pirtîrîn wan bi zarokên xwe re bi tîrkî dipeyivin û navêni tîrkî li wan dikin.

Mînakeke bâlkêş ku divê bê gotin, di çalakî û pîrozbahtian de, ji bo stranîni bi erebî bîn gotin, kesen kurd ji dê-leva demokratîn ku bi eslê xwe ereb in hewl didin. Ji vê yekê tê fîmkirin ku ji



Dîmenek ji navenda Mêrdînê

baweriya netewetiyê dûrbûneke bê-hempa heye.

Dewletê li navenda Mêrdînê her malbatek bi awayekî, bi xwe ve girê daye. İro ji her malbatê miheqeq yet an dudu karmend in. Ji bo vê yekê jî kesan xwe deyndarî dewletê dîtine.

Berî 12'ê rezberê têkiliyêne gelek xorten ereb bi çepgiran re çêbûye. Lê piştî 12'ê rezberê kilit li mejiyê xwe

Bi qasî du salan e ku komeleyên karmendan hewl didin ku saziyên din jî bikişînin ser xeta rastiyê. Di sala 1996'an de "Platforma Demokrasiyê" ava bû. Di nava wan de hinek komeleyên karkeran jî hene, lê pir dernakevin pêş. Vê platformê jî hê çalakiyêni bi bandor û xuyayî pêk neanîne. Li Mêrdînê çalakî û pîrozbahî hê jî hêwanan derneketiye qadan.

xistine. Her wiha xwe ji kurdan û têkoşina wan bi dûr xistine. Mînakeke bâlkêş; Kenan Evren ev peyva xwe li Mêrdîn kiriye: "Her tim erebêni Mêrdînê ji bo pêkutiya ku li ser kurdan bûye, gotine 'çi min jê'."

Dîsa mînakeke bâlkêş: Du xorten ereb di dolmîşê de rîwî ne. Dema ji bo sehkîrinê leşker wan disekeñinîn û hemû rîwîyan dadixin, yên ereb danakevin. Ku serbaz ji wan re dibêje "çima

hûn danakevin?" dibêjin: "Em ereb in, em ne kurd in' serbaz dibêje "icar ereb ji ku derket' û li wan dide.

Ji bo ku ereban xwe ji kurdan bi dûr xistine û ji dûranî ve lê nihêrine; dewletê jî zor nedaye wan. Ji bo vê yekê jî alozî li nava Mêrdînê çênebûne. Gelek kurdan jî ji bo vê rehetiyê xwe li Mêrdîn girtine.

Di dîrokê de jî mînakeke bâlkêş he-

dibe, gora wî hê jî li gundê Mêrdînê Zonê ye.

Li Mêrdînê têkiliya kurd û ereban

Heta bîst sal berê xetên stûr di nava ereban û kurdan de hebûn. Ji ber ku gundê Mêrdîn bi piranî kurd bûn. Ereban ji kurdan re digotin: "Gundi" û kurdan jî ji wan re digot: "Bajarî". Hê çiqas ne wekî berê be jî hê jî bi wateya kurd 'gundi' û bi wateya ereb 'bajarî' tê gotin.

Hê jî têkiliyêni navçeyen Mêrdîn bi navendê re qels in. Navçeya ku herî têkiliya wê bi Mêrdînê re heye, Qoser e. Nisêbin û Midyat bi serê xwe navend in. Dêrik û Şemrex (Mezidax) bi Amedê re têkildar in. Gelê Stewrê ji ereb e, lê têkiliya wê pir bi navendê ri tune ye. Li Stewrê jî wekî Mêrdînê ni-jadperestî heye û neteweperwerî gel-perwerî tune ye. Gelekîn wan xwe ji tirkân bêhtir tirk dihesibînin. Gelê navenda Midyatê, cihêni wekî Rîşmil û Qubala jî mihelmi ne. Mirovîn mihelmi jî xwe ne kurd û ne ereb dibînin. Li ba ereban ereb, li ba kurdan kurd in.


Bi xurtbûna tevgera azadiyê re mirovîn ereb û mihelmi carinan dibêjin da-pira mîn'an bâpi're mîn jî kurd e:

Di van salên dawîn de gelek ên mehelmî jî xwe li navenda Mêrdinê girtine û şorbe bûye tevlihev. Belê ew jî di bin bandora “çî min jê” de mane. Bê guman divê gazina mirov ne ji ereban, ji kurdan hebe. Divê kurd ne di bin vê bandora ve bîrdozê (îdeolojî) de bin.

Gelek ereb, mihelmî û kurdan di pêvajoya şer de xwe li Qoserê jî girtine. Tiştekî xuya jî bi xurtbûna têkoşina gel re, li Qoserê ‘tefecitî’ yê dest pê kir. Xeyalê dewlemendiyê, hişê pirî kesan dagirtine. Lî di pêvajoyê de, baş xuya bû ku wekî ‘rant’ a şer di kişandina nefte (mazot) de ji çete û rehêne wan sùd wergirtin. Îro Kamil Acunê ku waliyê Şîrnexê ye, baca ku distîne pê çete û partîyen xwînxwar xwedî dike.

Rewşa derdorê demokrat

Îcar em hinekî li ser derdorê demokrat bisekinin. Karmend û demokraten Mêrdin di pêvajoya şer de bi piranî temaşevanî kirine. Dûrî jiyanâ birêxistinî sekinî ne. Perdeyeke reş kişandine ser çavên xwe. Li Mêrdinê eniyeke dijber ava nekirine. Hewldanenî heyî tiştên hêja ne. Wekî komeleyen karmendan (Eğitim-Sen, Tarim Sen, Bel-Sen). Lî ne bes e. Bi qasî du salan e ku komeleyen karmendan hewl didin ku saziyên din jî bikişinin ser xeta rastiyê. Di sala



1996'an de "Platforma Demokrasiyê" ava bû. Di nava wan de hinek komeleyen karkeran jî hene, lê pir dernakevin pêş. Vê platformê jî hê çalakiyên bi bandor û xuyayî pêk neanîne. Li Mêrdinê çalakî û pîrozbahî hê ji hêwanan derneketiye qadan.

Divê mirov rewşa karkeren ku di kargehêن Mêrdinê de karkeriyê dîkin jî raxe ber çavan. Mixabineke kûr û dûvdirêj ji bo wan heye. Ji wan karkeran ji sedî nod di neynika "Türk-isê" re li xwe, welatê xwe û li dînyayê dinêrin. Piraniya karkeran beriya şer hatine Mêrdinê. Kargehên heyî jî, rîveberiya wan bi zordariyê dimeşe.

Mînak: Kargeha çimentoyê ji sedî

51 ya OYAK'ê ye. Zoreke mezin li ser karekên vê derê xuya ye.

Karkeren Xizmeta Gundan (Köy Hizmetleri) jî bi piranî li xwe miqate ne, ji bo ku di demsala kar de bêne xebitandin, navêne xwe jî bi nizm û sistî dibêjin. Ev karker û karkeren bi doman (qedrolî) tu carî rîexistinê bi nirx ava nekirine û ji bo eniya dijber hewl nedane xwe. Ku mirov dipirse: Çima? Dibêjin: Karkeren bi doman mehê 65 milyonî distînin û karkeren demsalî (Mevsimlik) jî, ji quata kirina kar ditisin ku di saziyên demokratik de hevalbendiyê bikin.

Di yekê gulanê de dema pîrozbahî li Mêrdinê hate rojevê, karkeren van kar-

gehan qet hewl nedan xwe ku 1'ê gulanê li qadan pîroz bikin, an jî li hêwanan. Pêşniyazên komeleyen karmendan jî bê sùdê man.

Ji bo van sedemên li jorîn jî pîrozba-hiyen Newrozan jî tim di hêwanande mane. Dîsa dibe ku ji bo van sedeman partiya HADEP'ê bingehêke xurt zeft nekiriye û rîberiya wê qels maye. Di-vê HADEP li gorî van şertan xwe saz bike û rîberiyê ji gelan re bike.

Dîsa jî em bawer in ku têkoşinê pêşî re li her kesî vekiriye. Her çiqas di pratikê de her tişt baş xuya nebe jî, mejî li her kesî zelal e û hê jî zelal dibe. Mînak koçberen ku li Mêrdin bi cih bûne li ser navê biratiyê, ji bo jiyanek azad, xwe baş didin naşîn. Lî dîsa jî, ji bo ku ke-da têkoşinê ji gel û gelan re bibe bingeha jiyanek bi rûmet, sazî divê, kedeke ji dil û can divê. Divê karker û karmend, ji jiyanâ birêxistinî bawer bikin. Bi qasî baweriyê jî ked divê.

Em bi bawer in ku iro şaxa NÇM'ê li Mêrdinê hebûya, wê hemû gelan di pratikê de bidîtana, bê ev tevgera hemdem çiqas rûmeteke mezin rê gelan, çanda gelan û nirxen hemdem dide.

ÇIYA MAZÎ, CİHAN ROJ

Rehmet li kefendizê berê be

CELALETTİN YÖYLER



Di nava pêşiyen me de, gotinê pir manîdar û bi nirx hene. Wekî çawa ku ji bo kesen ku xûyên xwe bernadin dibêjin: "Kurmê şîri heta pîn" Bi rastî rejîma xwînxwar, ev heşte sal e xûyê xwe yê xwînjandinê bermedaye. Gelê me ev peyv jî gotiye: "Xeta xwar ji gayê pîr e." Hem jî dibêjin: "Tu çiqas pişîkê bavêjî li ser çarlepken xwe dikeve." Rejîma nîjadperest çiqas karbdesten wan bêne guhartin jî ew her wekî pişîkê û gayê pîr in. Anglo hem xwedîyê xeta xwar û hem jî dixwazin wekî pişîkê tim li ser çaplepkän bikevin. Bi rastî kiryarê rejîma tirk çîroka "Babaqulî" tîne bîra mirov. Keskî rîber û şîlînkar heye.

Ew dixwaze rîwiyeke bişîlîne. Derdikeve pêşîya rîwi, dibêje: "Ezê te bişîlînim", rîwi jê re dibeje: "Bira bo Xwedê tu çîma min dişîlînim". Rîber li hemberî vê gotinê dibêje: "Şîlandina, karê min e" rîwi dibêje: "Gelo navê te çi ye?" Dibêje: "Navê min Mihîmed e", rîwi jê re dibeje: "Gelo navê bavê te çi", rîwi rîwi dibêje: "Ebdille ye." Rîwi dibêje: "Bi

Xwedê tu min naşîlinî, lewre navê te navê pêxember, navê bavê te navê bavê pêxember e, tuyê çawa min bişîlînim?", rîber hinekî diponije dîsa tamarê xirab têne û dibêje: "Ezê te bişîlînim", rîwi dibêje: "Gelo navê kalkî te çi ye?" Dibêje: "Navê wî Babaqulî ye." Rîwi, dibêje: "Ez êdî bawer dikim ku tuyê min bişîlîni, lewre fesadî ji Babaqulîye te tê." Ev heftê sal e peyayê (zilamî) rejîma nîjadperest, xwe li ser kar in li pey hev dibin hikûmet, yek diçe yek tê. Lî ji bo xatirê Xwedê çawa yek ji wan ji yê berî xwe yek gavekê bi tenê jî, ji bo mafê mirovan û pêşvebirina vê komarê li xêzeke hemdem navêtine.

Tevgeren wan ên nemirovane û nîjadperest bûye wekî peyva ku dibejin: "Rehmet li kefendizê berê be", dibêje: Li welatekî mirovek her tim tîrbîn kesen nû mirî vedike û kefenêñ miriyan didize. Demek dibore ew kes dimire û kurê wî rîcîka wî dişopîne û kefenêñ miriyan didize. Dema ku kefenan didizé, darekê jî di paşîya mirî de dikute. Li ser vê tevgerê gelê wê deverê dibêje: "Rehmet li kefendizê berê be, wî kefen tenê didizî, ev hem kefenan didize hem jî daran di paşîya miriyan me re dike."

A, em kurdên reben dema ku li rîveberen rejîma nîjadperest temâse dîkin, em dibînin, ku yêni hatî jî yêni çûyî nê qenotir in. Wekî niha rîveberen hikûmeta iro (koalisyonâ

ANASOL-D) bi taybetü jî cîgirê serokwezîr (Cenabê Bûlent Ecevit) dibêje: "Ezê ji kurdan re gundêñ şaristan (köy-kent) ava bikim." Gelo ev mirov ji bo ku qenciyê bi kurdan tike, projeya xwe ya kevnare dişopîne? Na, ez bawer nakim ku ev ramana wî ya pêşverûti û mirovahî be, her ev raman ya nîjadperestî dijminahî ye. Lewre heke mebesta wî ji bo hezkirin û pêşvebirina gelan be, wê ev vê projeya xwe, di berîn de li welatê xwe û ji bo gelê xwe yê rojavayê bixebitîne.

Em baş dizanin ku ev projeya wî ji bo dorpeçkirina gelê kurd e. Ew ji mebesteke wî yê pir çepel û xirab e. Li hêla din tu dînihêrî wezîrê dadê (Oltan Sungurlu) hê ji 'Şewket Kazan' pintitir diponije. Şewket Kazan, rasterast li meydânê deh dîlîn şer di Zîndana Amedê de serê wan da ber daran û perçqand û got ez ji ber ku partieke bi navê îslamê me, ez mirovîn li hemberî re-jîmê bi şûrekî serê wan difirînim. An jî bi baweriyâ xwe ya îslamiya osmanî serê wan diperçqînim. Dîsa rehmet li kefendizê berê be. Mebesta wezîrê nû hê jî xirab e. Lewre ew dibêje: "Divê ku kurd, bi ezab hêdî hêdî bimirin û bi zanîn ku em neviyên Cengîzhan û Hîlako ne." Ev nîjadperest tu demî nabin mirov û nayêne nav koma mirovahîye, hetanî ku di gemara xwe de nexeniqin.

Welatê min ê di bin postalan de

Eşa hesreta te di dilê min de birîneke mezin e. Kevirên te, ax û çiyayê te her dem di xeyalê min de ne. Gava ku min serê vê sibê ser û çavêن xwe şûştin, Dicle, Firat û Münzûr hatin bîra min. Duh bîranîna te di mîjîyê min de zindî bû. Meşa me ya li nav di berfê, ew livbaziya pêşî, ew sekinîn li ser tirba şehîdan û ew serhîdanê mîna lehiyê tev mîna şerîda filmekî di ber çavêن min re derbas bûn. Di nav van xeyalan de, min xwe winda kir. Girêkeke mezin kete qirika min. Laşê min geh germ bû geh sar bû. Çavêن min tarî bûn, laşê min ricifî û lerizî. Mîna pertikêñ darê li ber bayê hejiyam.

Piş re dengê hesin kete guhê min. Min guhê xwe bel kir û bas guhdarî li wî dengî kir. Ev deng, dengê tanq, firokeyan bû. Yek car teqîneke mezin hat. Ev dengê teqînê wisa bi şid bû ku axa di bin lingê min de hejiya. Ev teqîn a hewan, topan, bombeyan û çekêñ giran bû. Pêda dengê 'Allah allah' wekî nêzîk bû. Şîqesîqa singûyan bû. Min serê xwe rakir û li jor nihêrt. Ji dereke dûr ve

ewrêñ reş û tarî ji erdê radibûn û ber bi asîman ve hildikişîya û bilind dibû. Xemek kete dilê min. Gelo ev deng, ev teqînî û ev ewrêñ reş li ku derê çedîbin. Min berê xwe da rojê û piş re min li siya xwe mêze kir. Dema nîvro bû. Dîsa min guhê xwe dayê û çavêن xwe vekirin. Min dît û fêm kir ku ev rewş li ser te diqewime.

Cavêن min sor bûn, aqil ji serê min çû. Hêrseke mezin bi min girt û min xwe winda kir. Min kulmîn xwe guvaştin, tevahiya hêza xwe kom kir, serê xwe bilind kir û min baz da. Bayê cemidî mîna şîrmâqan li nav rûyê min diket. Ez mîna teyrekî difiriym. Pir derbas nebû, serê min li dîwarekî ket, ez paş ve pekiyam û li erdê ketim. Ci bû ji min, ci-hate serê min, min fêm nekir. Xwîn ji bedena min herikî, cîhan li min tarî bû û ez ji hişê xwe çûm. Ez nizanim kanê çiqas dem derbas bû. Gava ku ez hişyar bûm, min çavêن xwe vekirin, min dît ku tiştek neguheriye. Bi zor û zehmetiyeke mezin dîsa rabûm ser xwe, berê xwe da rojê û li saeta xwe nihêrt ku dem esir e. Min fêm kir ku min tenê bi

çend saetan hişê xwe winda kiriye.

Ciqas dem dîborî, deng zêde dibû. Vêga dengê mirovan ji dihat. Dengê jin û zarokan bû. Qêrin, hawar û feryad li heft qatê asîman disekinî. Ev qêrin û hawar a dayik, xwîşk û birayê min bû. Di hundirê min de ba û bager rabû, dilê min mîna daholê lêdixist. Min êşa di canê xwe da ji bîr kir. Û ez dîsa firiyam. Hêja min çend bask nehe-jandin serê min careke din hêj hişktir li dîwar ket. Û ez dîsa li ser pişte li erdê ketim. Gava ku min careke din çavêن xwe vekir, roj çûbû ava û cîhan tarî bûbû. Li asîmana tiştek xuya nedikir. Stêrkan jî rûyên xwe veşartibûn.

Hinek di halê xwe da sekinîm û çend gotin ji devê min der-kekin: "Ax welatê min, tu dişewitî ez dihelim. Tu di bin postalan de yî, ez di nav çar dîwaran de me. Tiştek ji destê min nayê."

Min xwest ku carekê din rabim ser piya. Hêja min xwe rast nekiribû, ji hêdîka ve birûskek pê ket, tariya asîman qelaşt û

li ber min ket. Piş re ew birûsk guherî, bû mirovekî ciwan. Cilêñ leşkerî li bejna wî, çekek li milê wî û çend bombe bi teniştâ wî ye daliqandibûn.

Pirtûkek jî di destê wî de hebû. Bi dengekî zelal û germ gazî min kir.

Heval! Wisa xwe neheline. Ev peritîna te bêfeyde ye. Bi vê rewşê tu nikarî tiştekî baş bikî. Wisa xuya dibe ku te ez ji bîr kirime. Ez bedeneke mezin im li hemberî dijmin. Di nav şerekî dijwar de me. Bila dilê te rihet û xweş be. Tola qêrin û zarîna dê û xwişkîn me tê hilanîn. Lê nayê wê wateyê ku tu bar naakeve ser milê te. Erê, karekî pir mezin dikeve ser milê te jî. Karê te ew e ku tu ji her hêlê ve xwe xurt û bi hêz bikî, vîna xwe tûj bikî û tu xwe ji derve re amade bikî. Tu carî min ji bîr neke û giraniya xwe bide ser xebata xwe."

Pişti van gotinan bi destê min girt, ez rakirim ser piyan û pirtûka destê xwe dirêjî min kir. Bi dirêjkirinê re ji min re wiha got: "Ev pirtûk çeka te ye. Kîngê te ev çek bi awayekî delal da şixulandin wê hîngê tu yê nêzîkî min bibî." Piş re destê xwe danî çeka li ser milê xwe û ahaftina xwe berdewam kir.

Ancax bi vî rengî tu yê bibî lay-iqî vê çekê."

Bi dawiya gotina xwe re destê min şidand û hejand. Piş re hew ku min dît bû stêrkeke mezin û geş û ber bi asîmana ve hîlkîşîya û bilind bû. Min serê xwe hilda li asîman nihêrtî, min dît ku her der bi stêrkan ronî bûye. Piş re ez fetîlîm hundir, çûm li ser maseya xwe rûniştîm. Bi awayekî bi hurmet min pirtûka xwe vekir û dest bi xwendinê kir. Çiqas min rûpelek dixwend, dengê girîn û zarînê dûr dibû, di şûnê de dengê kîfî, ken, şâhiyê û dilgesiyê dihat. Bi vê re ji dengê stran û helbesten şoreşê guhê min dagirtin. Dilê min jî şa bû, ken kete ser lêvî min û hema ez rabûm ser xwe, derketim derva û careke din ez firiyam. Ez firiyam ber bi teva, da ku bişkinim pozê xwe bêhna kulîkîn reng bi reng, derxim ji dilê xwe wê hesreta mezin, dîsa şad bidim bi te welatê min. Ez li ku bim jî, bedena min li ku be jî, wê her dem rihe min bisire, qesta te bike û were bîghêjîne te welatê min.

Welatê min, Welatê min! we-la-te-min!

GİYASSETTİN ŞEHİR





Helbestvanê kurd ê azadiyê Cegerxwîn ji bo rizgariya gelê Kurdistanê wekî ew dibêje "Serxwebûn bê şer nabe" bi awayekî tun-tirîn xebat dikir. Helbesten Cegerxwîn yên bi şeweyekî hestiyar û tûjtirîn di nav gelê kurd de cihetî taybet digire.

Roja 19'ê tîrmeha 1997'an li ser bîranîna Cegerxwîn û helbesten wî panelek li NÇM'ê ji hêla Cigirê Serokê Giştî yê HA-DEP'ê Osman Özçelik ve hate liidarxistin. Di panelê de Osman Özçelik li ser jiyana

Cegerxwîn, têkiliyên wî hêviyên wî, armanca wî bi şeweyekî kûr û dûr li ser dîrok û wêjeya kurdî û hin nakokyîn di navbera Cegerxwîn û Celadet Ali Bedirxan de rawestiya.

Osman Özçelik di destpêka axaftina xwe de li ser wêjê û dîroka kurdî rawestiya. Wî bi bîr xist ku ziman di hebûna gelan de, pêşketin û netewebûnê de hêmana herî girîng e. Özçelik, nîşan da ku bingeha avabûn û mayîna welatparêziyê ziman e. Di berdewama axaftina xwe de daxuyand ku filozof, alîm, mamosî û pedegokê mezîn Ehmedê Xanî (1651-1707), wexta ku bi dest nivîsîna "Mem û Zin"ê dike, Ehmedê Xanî nizanibû ku wê ew destana kevnare bigihêje, sedsala bîsta û bibe mamosiyê Cegerxwîn.

Osman Özçelik dike xuyan ku heta û tu berhem bi hunermendî û hêza ziman negihaye qada Mem û Zin bê Shakespeare, Cervantes, û Fîrdewsî ji bo zimanê xwe ci ne Ehmedê Xanî ji bo zimanê xwe ew e. Özçelik diyar kir ku Cegerxwîn ji ber vê yekê Ehmedê Xanî ji pêxemberekî mezintir rîber qebûl dike û cara yekemîn di berhemê xwe de daxwaza yekîtiya ziman, çand û edetên karda kiriye. Her wiha Özçelik diyar kir ku Cegerxwîn di 18 saliya xwe de bi dest xwendina medreseyê kiriye û di medreseyê de fêri çand û wêjeya kurdî bûye. Di dema serhildana Şêx Seid de agirê welatparêziyê di dilê wî de vêdiikeve û dibêje "Ez kurdperweriyê ji Şewqî Begê Elbaqî hîn bûm." Piştî ku xwendin xelas kiriye, Feqî Şexmûs bûye Mele Şêxmûs. Di berdewama axaftina xwe de dide zanîn ku di sala 1943'yan de kovara ku ji aliye Celadet Ali Bedirxan ve bi navê Hawarî derdiikeve, Cegerxwîn ji di nav kadroyê. Hawarî de cih digire. Gelek helbesten wî di vê kovarê de tên wesan-din. Gel wî nas dike û bi nav û deng di-



be.

Di sala 1946'an de dibe endamê Ci-vata Azadî û Yekîtiya Kurdistanê ku na-vê wê komeleyê berê 'Xoybûn' bû. Her wiha Özçelik daxuyand ku piştî "Şoreşa Sor" di 1917'an de hêviyek mezîn xisti-bû dilê gelên bindest û Cegerxwîn ji vê yekê bêpar namîne û cara yekemîn di şîrîn xwe de qala proletarya dike. Wî ba-wer kiribû ku wê rojekê Artêsa Sor were hawara kurdan. Sala 1945'an Cegerxwîn vedigere Şâme ba Celadet Ali Bedirxan, piştî çar salan Cegerxwîn dibe hevalê komünîstan û rexneyan li Xoybûnê dire. Di vê demê de di navbera Celadet Ali Bedirxan û Cegerxwîn de niqaşen tûj çê-dibin. Cigirê Serokê HA-DEP'ê Özçelik daxuyand ku di sala 1953'yan de Stalin dimire û Cegerxwîn vê yekê wek xebera reş tîne ziman. Belê di vir de Osman Özçelik bi şeweyekî sergirtî naxwaze ku Cegerxwîn pesnê Stalin bide, Lewre ji dibêje: "Ji ber ku haya Cegerxwîn jê nîn e ku Stalin kurdê Sovyetê ji hev belav kiriye. Hin şandine Azerbeycanê, hînek ji şandine Gürçistanê û Kazakistanê..."

Osman Özçelik bi bîr dixe ku di sala 1957'an de hevalbendiya Cegerxwîn bi komünîstan re diqedê û ew bi hevalên xwe re saziya "Azadî" ava dikin. Di sala 1958'an de Azadî bi Partiya Demokratîn Kurd li Suriyê re dibe yek. Özçelik axaftina xwe wiha qedand: "Ez ne bawer im ku tu kesî bi qasî wî jiyana kurdan ya ci-vakî nas dikir. Tu kesî bi qasî wî navê teyr û tebayên Kurdistanê, navê kulîlk û nebatên welêt, halet û edawetên cotkari-yê nizanibû, kesî bi qasî wî navê malbat û eşîrîn kurdan nedîzanî û nas nedikir. Helbestvanê nemir li cografya Kurdistanê ciya bi ciya, newal bi newal, deş bi deş geriyabû. Wî dîroka kurdan hûr û kûr dizanî û zanebûna xwe di şîrîn xwe de, di çiroken xwe de misan dija."

AZAD AVAŞIN

- 28.07.1914: Şerê Cihanê yê Yekemîn dest pê kir.
- 28.08.1821: Perûyê serxwebûna xwe ilan kir.
- 29.07.1992: Nûçegihanê Kovara Özgür Halkê Çetin Abayay li Batmanê ji aliye hêzên tarî ve hate kuştin.
- 30.07.1979: Di berxwedana Siwêregê de Salih Kendal di riya welatê xwe de can da.
- 31.07.1992: Nûçevanê Rojnameya Özgür Gündemê Yahya Orhan li navenda Kercewsa Batmanê ji aliye kontrayan ve hate kuştin.

- 01.08.1927: Mao Zedung li welatê Çinê Artêsa Rizgariya gel ava kir
- 02.08.1990: Dewleta Iraqê, Kuveyt dagir kir. Pişti dagirkirina Iraqê dewletên wekî Amerika, Ingiltere û Fransayê bi hêzeke mezîn Kuveytê ji bin dagirkirina Iraqê xelas kirin, di vê navê de bi hezaran gelê iraqî yên sivil ji ber bombe û êrisen van dewletan hatine kuştin.
- 02.08.1978: Dr. Nuri Dêrsimî çû ser heqîya xwe.
- 03.08.1914: Almanya li hemberî Fransayê herb ilan kir.

AWIR

Helbestvanê Nemir Cegerxwîn

ÇAVDÊRÎ

AMED TIGRIS



Berjewendiyê neteweyî û yên şexsî

Di nav kurdan de bi salan in ku li pêş hest û helwesta neteweyî, nezanbûn, kar û berjewendiyê (menfeetên) şexsî, malbatî, herêmî, dînî û komikî hebûne û bûne astengê mezîn û dijwar. Dema mirov li dîroka me ya nêzik, ya ji salen 1800'î bi şûn ve dinêre, bi awayekî zelal dibîne ku ev berjeweniyê biçûk ketine pêsiya berjewendiyê neteweyî. Berjewendiyê neteweyî yên herî mezîn û hêja ne û hemû berjewendiyê şexsî, malbatî û eşîrî di nav xwe de dihewîne. Dema berjewendiyê neteweyî têk herin an ji wînda bibin, yên din ên ku me li jor hejmartin ji hemû yet bi yek têk diçin an ji ji navê radibin. Jixwe berjewendiyê şexsî, malbatî, herêmî û civakî hemû di nav ên neteweyî de ne. Ev hemû bi hev du re berjewendiyê neteweyî pêk tînin. Ji ber ku heta niha berjewendiyê kurdan ên neteweyî nehatine parastin û yên ku hebûne ji ji aliye dijmîn ve ji holê hatine rakirin; yên din ên wek şexsî, malbatî û herêmî nemane û nehatine pejirandin ji. Yek ji wan nasnameya kurdan e. Dijminê dagirker hîn nasnameya kurdan yanî hebûna kurdan napejiîne; zîman-û çanda wan qedexe dike. Ev hemû di nav berjewendiyê neteweyî de ne. Berjewendiyê şexsî, malbatî, eşîrî, berjewendiyê temen-kurt in. Yên neteweyî temendirê in. berjewendiyê neteweyî wekî-keşîyekê (gemiye) ne. Dema keşî bin-av bibe an ji noqî bin avê bibe, hemû kes û tiştîn ku di keşîyê de ne bi hevdu re bin-av dibin. Mirov ji dewra İdrîsî Bedîsî bigire heta niha rewî wiha ye. Dewletên herêmîn carinan ji bo ku hînek axa, şêx û mîr sero-keşîren kurdan bikişînîn ba xwe û li yên din bixin, pere, mal û madelya dane wan. Ew li dijî kurdan bi kar anîne. Ji ber ku berjewendiyê neteweyî ji aliye dagirkeran ve nehatine qebûl kîrin. Çend sal piştî, dijmîn dema bin lingîn xwe saxlem kirine, vê carê vege-riyane wan û ew tiştîn ku dane wan bi paş ve ji wan girtine. Rewşâ kurdan her wiha heta îro dom kiriye û dike. Encama berjewendiyê şexsî û feodalî ev e.

Kar an ji bandora berjewendiyê neteweyî gelek mezîn e û wekî tiştîkî veşartî ye. Her kes nikare van nîrx û hêjahiyyê mezîn û pîroz bibîne. Kesîn zana û hişyar ve berjewendiyê zû bibînîn û ji bo vê yekê têbîkoşin. Çima berjewendiyê neteweyî nîv veşartî ye yan ji her kes nikare zû bi zû û bi çavekî bê berçavik vê yekê bibîne?

Ji ber ku kar û berjewendiyê şexsî û malbatî bêhtir darengî (madî) ne û di demeke kurt de tê dîtin û encam didin; lê yên neteweyî gelempere ne û zû bi zû nayê dîtin û encam nayê girtin. Ez dixwazîm di vê mijarê de çend mînakîn berbiçav bidim ku mijar bêhtir zelal û diyar bibe. Mirov dizewice, xanî çêdike, mal ava dike û zarok çêdike.. Zevî, bexçe û rezê xwe wekî malê xwe yê şexsî û arîzî dibîne. Ji ber vê yekê ji, bêhtir-lê mîze dike, bi şev û roj dixe-bite, xweş û geş dike û di demeke kurt de ber jê digire.. Genjî pembû, titûn. Tirî, firengî, zebeş, sêv û hwd. berhev dike. Rast e, ev dozîn (icğidü) bi her kesî re heye. Di jiyanekadeff de mirov divê van tiştan bike û jiyanekede xweş û normal bişî. Lî kar û berjewendiyê neteweyî ku yên herî mezîn, girîng û pîroz in wiha bi zelañ û di demek kurt de ne xuya ne.. Veşartî ne an ji nîv veşartî ne.

Halbû ku dema welat ne azañ be, axa mirov di bin piyîn leşkeren dijmîn de be, al, ziman, edebiyat û çanda mirov qedexe be; mal zevî rez, bexçe jin û zarok ne yên mirov in. Yen mirov bin ji mirov ne azañ e. Hatina neteweyî ya giştî ku di salê de bi mîlyar dolar e, ji xezîneya dijmîn re diç. Gel û welat sûd ji van kar û berjewendiyê darengî û manevî yên herî mezîn nabîn. Mirov dema li Kurdistan rengîn û dewlemedîn dinêre, welatekî rût û zilüt dibîne. Mirovên birçî û tazî dibîne. Bi hezaran zarokên nexwendî û perîşan dibîne. Hatînê ser û bin erdê yên Kurdistanê dikarin têra deh qet nîfusa Kurdistanê bikin.

Lê hezar mixabin gelê normal vê yekê nabîne, lê ew hatina biçûk a ku ji zevî, bexçe û rezê wî tê dibîne û xwedî lê derdiikeve. Dema kesekî destdirêjiya zevî, rez an ji pezê wî dike, wê demê dînyayê lê xerab dike. Ji bo zarok û endamên malbatî eşîrî xwe, çavê xwe ji sérnakutê û xwe dike kustî. Lî dema dor têser welat dike. "Kuro li kare xwe mîze dike, ma bi we maye.."

H eke nasnavê kurdan neyê nasî



Rêveberê Navenda UNESCO'ya Katalonyayê Felix Martí û loson ku
Katalonyayê li xebalkare liyana Rewsen Nejat Ayaz re iene dijin.

Ji kerema xwe re xwe bi xwendevanen me bidin nasin?

• Ez rêveberê Navenda UNESCO ya Katalonyayê me. Katalon neteweyek e di nava İspanayê de. Ew xwediyê çandeke cuda ne. Em di nava dewletekê de çar netewe ne: Kastilî bi İspanî, bask bi zimanê euzkera, katalon bi catalonî û gelê bi galîk zimanê galikî dippeyivin

Me li paytexta Katalonyayê li Barcelonayê, navenda UNESCO'ye ava kir ji bo ku têkiliyên di navbera çanda katalonî û UNESCO'ye xurt bibin. Di sala 1984'an de li ser erêkirina komîsyona UNESCO'ya İspanî, hikûmeta katalonî û li ser erêkirina Sekreteriya UNESCO'ye ya li Parisê ev navend vekir.

Ci cure maf di destê gelê katalon he-ne?

Niha mafen gelê katalonî yê çandi bêyi-qeyd û bend tê nasin. Ew têne wê wateyê ku zimanê katalonî di nava sînorê Katalonyayê de digel İspanî wekî zimanê fermî tê nasin. Yanê niha du zimanê me yê zikmaki û zimanê fermî yê İspanayê. Di hemû qonaxê perwerdehiyê de çanda me tê ferkirin, her wiha di nav sînorê Katalonyayê de perwerdehi bi zimanê katalonî ye. Dîsa televizyon jî bi zimanê me weşanê dîkin. Televizyonâ dewletê jî heye ku bi piranî bi İspanî weşanê dîke; lê cih dide katalonî jî. Divê bê gotin ku hinek televizyonê taybet ku bi zimanê İspanî weşanê dîkin jî hene.

Di aliye siyasi de destûra me ya taybet heye li Katalonyayê. Navê wê "Statüya Katalonyayê" ye. Li gorî vê destûrê ango qanûna bingehîn hikûmeta Katalonyayê bi riya hilbijartînî giştî ji nav partîyên siyasi bi awayekî demokratik tê hilbijartîn. Niha hikûmeteke me ku hemû partî tê de cih digirin li ser kar e, ew hikûmet di serî de mijarîn çand û perwerdehiyê, di gelek waran de xwedî râye ye. Her wiha ew hikûmet dikare li ser hawirparêzî, sazkirina derdora bajaran û hinek politikayê aborî jî biryaran bigire. Bêguman biryarên bingehîn ên li ser aborîyê di destê hikûmeta navendî ya

Madridê de ne. Lê di gelek warên têkilîdarî ayendeyê (pêşeroj) me de em xwendidiyî biryar in.

Ev çend sal in ku ew hikûmet didome?

• Hikûmeta Katalonyayê di çar salan de carekê tê hilbijartîn. Li gorî vê yekê ji du salan carekê hilbijartîn heye. Heke em niha ji bo hikûmeta katalonî hilbijartîn bikin, emê piştî du salan içar ji bo hikûmeta İspanî dengê xwe bidin. Em du hikûmetan hildibijerîn.

Hûn dikarin li ser erdê welatê xwe yê di nava sînorê de Fransayê ci bibe-jin?

Niha erdê katalonan di nava sê dewletan de hatiye parvekirin. Parçeyê mezin di nava İspanayê de ye û ji sê beşan pêk tê. Beşê katalon, beşê Valensiya û beşê girava Balerik. Ev her sê bes di nava dewleta İspanî de xwediyê statûyên taybet in. Parçeyekî erdê Katalonyayê jî di nav sînorê Fransayê de ye. Ev parçeyekî bicük e, lê gelê wê derê girêdayî çanda katalonî ye. Em bi gelê bajare Sardinya re jî xwediyê çandeke hevpar in. Bi qasî 300 hezar katalonî li basûre Fransayê dijî. Bi giştî hejmara gelê ku bi katalonî dippeyive 8 milyon e.

Dîroka gelê katalonî digihîje kîjan heyamî?

Wekî netewe di sedsala dehan de me xwe saz kiriye. Em parçeyekî İmparatoriya Ewrûpayê Kaorolenjiyan bûn. Di Serdema Navin de desthilatdarêne me gav bi gav jî İmparatoriyê hê zêde xweserî bi dest xistine. Paşê li cihîn cur bi cur ên Katalonyayê hinek dewleten xweser ên ezmûnerî pêk hatine. Paşê ji van hikûmeten xweser hinekan di nava Katalonyayê de cureyeke federasyonê pêk anfîne. Di dawiyê de (keyitiyek) (qraliyet) ava kirine. Vê keyîtiyê ji sedsala dehan heta sedsala 15'an dom kiriye. Em gelekî nêzî hikûmeta İspanî û dewleta galisiyan bûne. Her wiha em gelekî nêzî dewleta baskê ya bi navê Navarra jî bûne. Paşê keyatiyeke wekî ya berê pêk hatiye. Piş re malbaten ser-

dest ên katalan û kastiliyan ji hev zewicîne. Li dû vê yekê konfederasyoneke di bin destê qralekî de pêk hatiye. Sede-ma bihevre bûna me ya niha jî ew împaratorî ye. Konfederasyona rastîn di sedsala 18'an de dest pê dike.

Di destpêka sedsala 18'an de katalon li hemberî kastiliyan têk cûn, welatê wan ji hêla artêsa kastiliyan ve hate vegirtin. Pişti vê yekê hemû saziyên me ji holê hatin rakirin, kastiliyan dewleteke bi her awayî yekgirtî ku modela jakoben a Fransayê jî xwe re mînak digire, ava kir. Bîrânîn me yêni di warê azad-bûna çandî û siyasi de hetta sedsala 18'an diçûn.

Di sedsalîn 19 û 20'an de me ji bo bi destxistina azadiya xwe xebat kir.

Niha rewşa me gelekî baş e, lewre piştî ku demokrasî hate İspanayê, awayê rêveberiyê li seranserê İspanayê bû demokratik. Me mafê statûyeke taybet bi dest xist. Niha em di nava qonaxeke wisa de ne ku dibe ku Katalonya di nava Yekîtiya Ewrûpayê de bibe endameke serbixwe. Yanê endameke serbixwe yê Ewrûpayê ku bi dewleta İspanî re xwediyê têkiliyên taybet e. Lewre bi vê dewletê re gelek berjewendiyen me yêni hevpar hene. Ji ber vê egerê wê têkili-

ji bo me pêwist nabîne, lewre divê artêsa Ewrûpayê ya tevahî hebe. Her wiha pêwist nake ku pereyên katalonan ji hebin.

Di "Serdema Komarî" de li Katalonyayê serhildanek pêk hat. Di vê serdemê de desthilatî li pişt komarê bû. Lê ew bi ser neket. Hêzên Franco Katalonya dagir kir. Serê dawîn "Serê Ebro" bû. Ebro sînorê di navbera İspanya û Katalonyayê de ye. Biryara yekemîn ya Franco rakirina qanûna Katalonyayê bû ku re dida hikûmeteke nermerê ya xweser û bikaranîna çand û zimanê me. Di tevahîya serdema Franco de gelê me bindest, çand û zimanê me di dibistan û weşanan de qedexe bû. Gelek mirov hatin dîrîzandin ji ber ku zimanê katalonî di dînûstandinê rojane de bi kar anîn. Lewre ji bo me şerê li Katalonyayê ne tenê, şerekî civakî ya çepgir û rastgiran bû. Li gorî baweriya Franco mirovén Katalonyayê bi piranî komarî bûn. Lewre gelek mirov hatin girtin; gelek rewşenbir derketî bûn, heta ku dawî li rejîma Franco hat.

Li gorî gotinan ol di dîroka we de xwediyê cîhekî taybet bûye, gelo cîma?

• Catalon zaf bi baweriya xiristiyani ve girêdayî ne. Bandora dîra katolik pir xurt bûye di dîroka me de. Di demen gran de hinek kêşeyen nêzî gel ji bo parastina çand û zimanê katalonî pir alîkarî kirin. Lewre ji bandora manastira Montserat gelek e li ser mirovan. Montserat bi awayekî vekirî piştigirya çand û zimanê katalonî dike û demokrasî di astete bilind de ye li Montseratê. Baweriyan olî di demen dîktatoriye de alîkarî-

Sempattiyeke me ya mezin heye ji bo gelê kurd heye, we gele-kî û azar kışandîye di domana (pêvajo) dîrokê de. Em ji bo kîşeya gelê kurd çaresertyeke adilane dixwazin. Çareserya kîşeya kurd girêdayî pergala dadî ya navneteweyf ye.

ya çanda katalonî û demokrasiyê kiriye.

Li Barselonayê navenda UNESCO'ye û li bajarêne wê şaxen wê hene, hûn dixwazin bi vê yekê ci daxwaza xwe pêk bînin?

Tîstê ku em li ser radiwestin ne dewlemendiya aborî ye. Ji bo me tîstê girîng aliye çandî ye, ziman û çanda me, gelê me ji İspaniya vediqetîne. Lewre jî dema em li ser UNESCO'ye bûn xwedî hinek agahiyan, gelek rewşenbir, hûnermend û nivîskaran xwest pê re dînûstandinê xwe xurt bikin. Ev rîexistin li ser zanist, çand, perwerdehi û warê civakî xebatê dike. Ew tîst ji bo me alîkariyek bû, ji ber ku em gelekî girîngiyê didin pêşebirina pir-alî ya mirovén xwe.

Çalakiyên we kengî dest pê kirin?

Di nîveka dema Franco, ango di sala 1960'î de, baweriya xwestina bereveniyê ji UNESCO bi me re çebû. Me got em dikarin bi vî awayî mafen xwe yê bingehîn kû di peymanen navneteweyf de hatine misogerkirin, biparêzin. Vê demê danîna peywendiyen navneteweyf gelekî dijwar bû. Ji ber ku İspanya bi

li Ewrûpa demokrasî pêk nayê

nê endamê Neteweyên Yekbûyî bû, de ma me qala maf û azadiyan bikira wê UNESCO em biparastina.

Ci reng çalakiyan hûn li dar dixin?

Em di gelek waran de çalak in. Wergerandina belge û pirtükên UNESCO'ye li zimanê katalonî, belavkirina wan li kesen rewşenbir, xwendekar û hemû kesen ku bi karê perwerdehî, zanistî û çandî dadikevin. Ew aliye kî çalakiyan me pêk tîne. Her wiha em di du waran de alîkariya Sekreteriya UNESCO ya li Parîsê dikan. Yek pêkanîna dânuştina di navbera jiyana olî û cihânî de; lewre em bawer in ku ol aliye kî girîng a jiyana çandî ye. Ji ber ku em aştiyê dixwazin, em dikan ku ol alîkariya pêkanîna aştiyê bike. Di sala 1994'an de me pêşengên ji hemû olan vexwendin Barselonayê da ku ji bo gesbûna çanda aştiyê peymanekê girê bidin.

Aliye kî din ji ziman e. Divê hebûna hemû zimanan bê parastin. Hinek ziman bi xetereya (talûke) windabûnê re rû bi rû ne, ji ber ku kesen ku pê dipeyivin gelekî hindik mane. Hinek ji ber peseta siyasi di heman rewşê de ne. UNESCO pêwist e alîkariya hemû zimanan bîke, lewre ziman gencine ye. Her wiha bernameyeke taybet ya UNESCO heye ku jê re dibêjin "Lingua Pax". Ev peyva latinî tê wateya parastina aştiyê bi alîkariya zimên. Armanca sereke ya vê bernameyê parastina curbicureya zimanan û alîkariya perwerdehiya pir-zimanî ye. Ji bo hemû zarakan tiştekî pir girîng e ku hîmî zimanê xwe yê zikmakî bibin. Berî her tişti zimanê zikmakî, piştre zimanê fermî, zimanen cîran û di dawiyê de ji zimanen navneteweyî weki îngilîzî, frensi, İspanî û çinî. Ev çalakiyan li ser zimên ji Parîs û Barselonayê têne meşandin. Sekreteriya Parîsê rîbernameya (pirtükên pedagoji) amade dike ji bo mamostayên li seranseri cihânî. Ew ji bo hikûmetan ji belgeyan çap dike. Dîsa semînerên li ser perwerdenasiyê (pedagoji) ji kesen têkildar re têne pêşkêskirin. Her wiha materyalên teknikî ji bo pevgirêdanen (network) li Katalonya û İspaniyayê û dibistanen UNESCO'ye têne amadekirin. Niha 40 dibistanen li Katalonyayê besdarî vê bernameyê dibin.

Pevgirêdana duyemin a bi navê "Pevgirêdana Komel ên UNESCO"ye 25 komele di nava vê pevgirêdanê de cih digirin. Ev tê wê wateyê ku welatiyên me yê li gelek gund û bajarên Katalonyayê hevkariyê di karê UNESCO'ye de dikan ji bo pêşvebirina mafen mirovan, çand û hawirpareziyê. Em li Katalonyayê ji van koman gişkan re xizmetê dikan. Komên me yê lêkolinê hene û bi taybeti li ser aştiya Bahra Spî lêkolinan dikan. Em li ser ewletiya herêma Bahra Spî û çareserkirina hinek nakokiyê li herêmê dixebeitin. Em serokên ciwan ên vê herêmê vedixwînin civînîn perwerdehiyê. Dîsa em ji wan kesan dixwazin ku dema vegezin welatê xwe di çalakiyan çandî de prensibên UNESCO'ye serwer bikin.

Hûn çalakiyan xwe çawa finanse di-

Niha mafê gelê katalonî yê çandî bêyî qeyd û bend tê nasîn. Di nava sînorê Katalonyayê de perwerdehî bi zimanê katalonî ye. Dîsa televîzyon jî bi zimanê me weşanê dikan. Bi qanûna bingehîn hikûmeta Katalonyayê bi riya hilbijartînîn gîşî bi awayekî demokratik tê hilbijartîn.

• Ji gelek saziyên derveyî alîkari tê ji me re. Alîkariya herî girîng ji rayedanî katalonî tê. Her sal parlementoya Katalonyayê ji bo me pereyan terxan (vegetandin) dike. Ew lêçûnên (mesref) çalakiyan me derdixe. Li aliyê din hin caran Sekreteriya UNESCO ya li Parîsê bi me re dikeve danûständinê û ji bo lidaristina hinek çalakiyan alîkariya me dike. Her wiha ev navenda me, ji hêla Weqfa Katalan ve hatiye avakirin, lewre pêdiviyen me yê bingehîn ji hêla wê weqfe ve têne temînkinin.

Ez dixwazim der barê serdestbûna çanda Amerîkayê li ser çanda cihânî de bir û ramanên we hûn bibim. Li hemberî mêtinkariya çandî hûn dikan ci bibêjin?

• Em li dijî mêtinkariya çandî ne. Li gori baweriya me asirandin û parastina nîrxen xweçihî ji bo pêşeroja Ewrûpayê

waran zanist û lêkolîn de divê em ji hemû welatan sûdê wergirin, lê divê em di warê çandî de reseniya xwe biparêzin. Baweriya me bi kapasiteya rîexistina me heye. Mirovîn tiral bindest dikevin. Em gelekî çalak in.

Hûn serdestiya Amerîkayê li ser Neteweyên Yekbûyî (NY) çawa dinirxînin?

• Pergala NY'ye li gorî mercen iroyin li pey demê maye. NY, li gorî pêdiyî 50 sal berê hatiye avakirin. Em niha di dawiya sedsala 20'an de ne. Divê pergala heyî di du hêlan de bê guherîn.

1) NY divê li ser saziyên demokratik ji nû ve ava bibe. Hewce ye saziyên ku NY'ye pêk tînin ne di xizmeta çend dewletan de bin. Em aligir in ku hêza û raya Meclisa Giştî zêde bibe.

2) Cihgirtina rîexistinê ne-hikûmetî ye. Ji bo gengeşkirina arîşeyen iroyin

din, niştecihê van deran hatine li guhêñ bajaran cih bûne, hinek jî çûne Ewrûpayê..

• Ez dikarim vê bibêjim, sempatiyeke me ya mezin heye ji bo gelê kurd, we gelekî êş û azar kişandîye di domana (pêvajo) dîrokê de. Em ji bo kêşeya gelê kurd çareseriyeke adilane dixwazin. Lewre kêşeya kurd ne ew kêşê ye ku mirov bibêje bila kurd bi serê xwe çareser bikin, ew girêdayî pergala dadî ya navneteweyî ye. Hewce ye cemawera cihânî alîkariya we bike, da ku hûn karibin di qada navneteweyî de bi nasnavê xwe cih bigirin. Ev berpirsiya me ye jî ku em di vî warî de alîkariya we bikin.

Di rewşa iroyin de kurd li derveyî rîexistinê navneteweyî têne hiştin. Hûn vê yekê çawa dibînin?

• Ew ne pirsgirêka we tenê ye, pir gel hene ku ne-xwedî dewlet in ji ber vê yekê jî li qada navneteweyî nayen temsilîkirin. Divê cemawera cihânî rîyekê bibin ji bo ku hûn jî bê temsilîkirin. Rewşa ku hûn iro tê de ne divê ji aliyê mirovahiyê ve jî neyê pejirandin. Pêwist e ku hûn bibin xwedîyê çarenûs û nasnavê xwe.

Wekî hûn jî dizanin Türkiye endamê NATO'ye, divê ew rîexistin çekan nefiroge vî welatî û jê bixwaze ku kêşeya kurdî çareser bike...

• Belê gotina we rast e. Divê hemû welatîn demokratik vî welatî rexne bikin ji ber ku nav û nîşanên gelê we, mafen we yê çandî û mafê domandina ji yana xwe li ser xaka bav û kalan, înkâr dike.


Em ji bo parastina reseniya çand û zimanê xwe li hemberî bandora çanda tirk, ereb û farisan jî li ber xwe didin. Derfetên me gelekî kêm in, em dixwazin hin karên çandî û perwerdehî bi rî ve bibin, lê derfetên madî û zagonen dewletan rî nadîn vê yekê, ji bo van çalakiyan em dikarin serî li UNESCO'ye bide?

• Heke hin proje ji ber nebûna derfetan û zagonen dewletan bikevin tengasiyê divê hûn ji bo hevkariyê serî li rîexistinê ne-hikûmetî bidin. Em pîr dixwazin di vî warî de bi we re hevkariyê bikin. Ji ber ku çanda we parçeyekî çanda cihânî ye.

Gotina we ya dawî ci ye?

• Morala xwe xera nekin. Hin caran arîşe li mirov gelekî giran dibin. Di maweyekî navincî de pirsgirêk çareser dibin. Li Ewrûpayê berbendkirina çand û rastiya gelan né xislekî awarte ye. Her çiqas hûn gelê dawîn bin ku nasnavê we nehatiye nasîn, lê pîr najo wê ev rewş biguhere. Lewre li Ewrûpayeke ku lê çand û nasnavê gelekî were redkirin, tu carî demokrasi pêk nayê. Ewrûpa nabe demokratik heke hûn bi nav û nîşanên xwe nebin endamê pergala demokratik.

HEVPEYVİN:
NEJAT AYAZ
JI İNGİLİZİ WERGER:
SAMÎ BERBANG



Xweçihî dixwazim der barê serdestbûna

gelekî girîng e. Em niha kêfxweş in ji ber ku em ewrûpî ne, em di nava çandeke xurt a dîrokî de ne. Çanda itali, İspanî û katalonî pir xurt e. Arîşeya sereke ji medyayê tê, ji ber ku ew di destê pâwanen (tekkel) pir-welatî de ye. Ew xwedîyê hêzeke mezin in, lewre dikarin imperializm çandî pêk bînîn. Em li televîzyon temâse dikan, film û bernameyen di televîzyonan de ji hêla amerîkî û japoniyen ve hatine kişandîn; bi bandora wan film û bernameyan nîrxen me yê xweçihî qels qibin. Ew berpirsiya me ye ku em di bin bandora çanda pawanan û welatîn mezin de nemînîn. Di

en mirovahiyê di asta cihânî de ev yek pêwist e. Di diwarojê de dibe ku du-meclisi were rojevî. Yek ji wan wê nûnertiya neteweyan bike, ya din ji van rîexistinê binimîne. Lî berî her tişti divê demokrasi li welatîn endam pêk were, heke wisa nebe gel li NY'ye nayê temsilîkirin.

Niha ez dixwazim werim ser rewşa Kurdistani. Çar dewletan ew li hev parve kiriye, ez bi xwe ji bakurê Kurdistane me, têkoşîna jî bo rizgariyê li yî parçeyî gur dibe, li hemberî vê yekê sê hezar gund hatine valakirin û şewitan-

Binefşâ Narîn û Cembeliyê

Mîrê Hekarî -vi-

Li pey van gotinan Cembeli gazi wan dike, dibêje kî şertên min bîne cih ezê bi wê re bizewicim. Pîrê û qîza xwe bi helecan dibêjin ka şertên xwe bibêje şertên te ci ne? Cembeli dibêje şertê min ew e ku ji we herduyan kê pêşî di karmaxê de ji min re av anî, ezê wê bis-tinim.

Pîrê û qîza xwe radibin bi lez û bez her yek karmaxekê hildidin û baz didin ser kaniyê. Pîrê û qîza xwe karmaxê di din ber çirika kaniyê dikin û nakin karmax tijî av nabe. Bila ew bi av û karma-xê re dakevin; Cembeli ji bi lez û bez radibe li hespê xwe siwar dibe û ji mala wan direve û berê xwe dide çol û beyaran. Pir tê, hindik tê, rastî birekî pêz tê. Cembeli berê hespê xwe bi meşeke rehwan dide nava keriyê pez û bala xwe didê şivan li çenga pêz sekiniye, kulavê wî li milê wî ye û bi dengekî şewat awaz li bilûrê dixe. Cembeli silavekê li şivan dike û li cem şivan peya dibe. Cembeli ji şivan siwal dike, dibêje: "Şivanê delal, tu şivanê kîjan êlê yî?" Şivan ji dibêje: "Ez şivanê êla Dewrêş Begê me. "Cembeli ji şivan dipirse: "Dewrêş Beg mirovekî çawa ye?" Şivan ji dibêje: "Dewrêş Beg mirovekî pir dêwlemend û pir delal e, lê belê ev salek e serê wî di belayê de ye", Cembeli dibêje: "Xêr e, ev ci bela ye ku hatiye serê Dewrêş Beg?" Şivan dibêje:

"Wele ev salek e bi Binefşâ qîza apê xwe re zewiciye, lê belê Binefş tu qedr û rûmetekê nade Dewrêş Begê û pê re xeber nade, ji ber vê yekê hiş û eqil di serê Dewrêş Beg de nemaye û serê wî tim di xax û lorêngiran de ye û tim di nava xeyal û mitala de ye." Cembeli pirsgirêk û xemêngirê Dewrêş Begê hîn di be û ji şivan re dibêje: "Şivan were em kincênen xwe bi hev biguherin, ezê cil heb zêr û hespê xwe ji bidim te, ezê di dewsa te de bibim şivan, tu ji bide re here mala xwe." Şivan ji difikire û dibêje ji vi tis-ti xweşîr rehma Xwedê ye, ez li ser çavênen xwe û çavênen bavê xwe qebûl dikim."

Şivan radibe kincênen xwe ji xwe dike, dide Cembeli, Cembeli ji kincênen xwe ji xwe dike, dide şivan. Şivan kincênen Cembeli li xwe dike û zérênen xwe dixe berika xwe û li hespê Cembeli siwar dibe xatir ji Cembeli dixwaze û berê xwe dide mala xwe diçê. Cembeli ji radibe kincênen şivan li xwe dike, kulavê xwe davêje navmîlê xwe, dar dide desten xwe dixe fikinî û dide pey ke-riyê pez.

Di navberê re roj derbas dabin, Cembeli di emrê xwe de tu zorî û tengasi nedîtiye, tim û tim di nava xwesi û delaliye de mezin bûye, dema ku roj derbas dabin Cembeli ji ber ku ew tengasiya şivantiyê nedîtiye dev û lêvîn wî tev diqelişin, rûyê wî bihustek dirêj di be, dest û lingê wî tev basûr digire û diqelişen, Cembeli dikeve rewşek wisa ku hal tê de namîne.

Her roj cariyêne ûla Dewrêş Begê tê bêriyê gava pez didoşin, tişî cariyekê dikeve Cembeli. Cariyêne hevalen wê, tev pez didoşin, elbîn xwe tiji dikin ew ji, ji



kerba-bedewbûna Cembeli dema pez didoşen şîre xwe tev didoşen erdê, dema dotina pez xelas dike, elba wê vala dimîne. Dema êvarê tene malê Binefş jê dipirse, dibêje: "Ka şîre te?" Ew ji jê re dibêje "Xanim miyeke me heye, pir cinû ye, gava ez pez didoşim, tim tê li elba min diqeliben û şîre min dirijine."

Ev meseleya cariyêne rojekê ye û ne dudu ye, her roj halê cariyê ev e. Binefş ji bala xwe didê ku di vi tis-ti de ecranekî heye, rojek radibe bi cariyan re berê xwe dide bêriyê û diçê cem cariyê, dibîne ku carî zûr bûye, çavênen xwe kutane bejn û bala şivan, şîre ku didoşen ji tev dirijine erdê. Dema Binefş dibîne ku carî şîr dirijine erdê diçê cem cariyê, elbikê li serê cariyê dixe û dibêje: "Delalê te nedigot ez li ser şivan bengî û evîndar bûme!" Te digot miya cinû li elba şîre min diqeliben û dirijine," Binefş, cariyê ji ser kevirê bêriyê radike di dewsa cariyê de rûdine, dest bi dotina miyan dike. Dotina pez xelas dike, miya quer bi tenê dimîne. Dema miya quer ji miyekê pir cinû ye û ji destê Binefş direve. Binefş bi hêrs gazi şivan dike, dibêje rabe miya quer ji min re bîne, ezê bidoşim. Cembeli dibêje: "Xanim miya quer pir cinû ye, tu wê nedosî ji dibê, tu rabe here bîla carî werin bidoşin."

Gava Binefş serê xwe bilind dike, li şivan mîze dike, bala xwe dide dev û lêvîn şivan tev qelişine, dest û lingê wî tev werimîne, rihe wî bihustek dirêj bûye; jê re dibêje Xwedê bela xwe bide te, kêt tu xistiye şivanê êla me, wa tu dimîri nikarî li ser lingê xwe bisekinî, tê ji me re çawa şivantiyê biki û pezên me biçerîni. Careke din dibêje: "Rabe miya quer ji min re bîne, ezê wê bidoşim."

Cembeli radibe ser lingê xwe û di de pey miya quer, mî ji li wî, alî vî alî direve, qelsêne lingê Cembeli xwîn jê tê, Cembeli wiha li xwe mîze dike, dilê wî bi halê wî dişewite û ji xwe re dibêje ez Cembeli yê mîrê Hekariya bim, ez bi çol û beyana bikevim ji bo xatirê Binafşê bibim şivan vê kul û keserê bikişinim. Bi dilekî kul kulavê xwe ji navmîlê davêje erdê, bilûrâ xwe derdixe dide ser dev û lêvîn xwe yê mîna pelên cixarê ku iro ji qelişine bûne mîna xetîn kotanê, dengekî zirav bi bilûrê dixe û pê re gazî miya quer dike û dibêje:

*De weyla lê miya querê dilê min
dibê yo*

*De tu ji ber min nereve were ser
bêriyê yo*

*De tu nizanî ez Cembeliyê Mîrê
Hekariya*

*Hatime ji bo Binefşâ Narîn bûme
şivanê Dewrêş Begê yo*

*Qelş bi lingê min ketine mîna
xetê konê yo*

*Qidûmê min nemaye ez li pey te
birevim*

*De tu vegere were ser bêriyê yo
Bila Binefşâ Narîn ji bo te ji min
re pirsa nebeje*

*Li ber cariya, tehna li min nexe li
rûyê dinê yo*

De lorî, lorî lorî looorî lorî

Bi dengê Cembeli re miya quer tê li ser bêriyê dise-kine: Cembeli bi serê miya quer digire, Binefş ji dikêve binê miya quer didoşen, gava Binefş dotinê xelas dike, radibe ser xwe, miya quer xwe li destê Cembeli dixe û direve, Cembeli serpişt dikeve erdê, qama Cembeli ji ber pişta wî dikeve erdê. Ew qame gava Fariz Beg ji ber Dewrêş Beg direve diçê Hekariya, wê demê Cembeli Binefş ji xwe re nişanî dike û tê nava kona, Binefş dema wî dibîne, radibe wê qamê diyarî Cembeli dike.

Dema çavênen Binefş bi qamê dikeve dibêje wele heye-tuneye ev Cembeli ye. Edî li ber cariya qet dengê xwe dermaxe, radibe cariya li hev kom dike û berê xwe dide malê û tê nava êlê. Bala xwe didê Dewrêş Beg li ber deriyê malê rûniştiye, Binefş ji Dewrêş Begê re dibêje: "Serê te bixwe bi ser axatiya te de, tu qet ji Xwedê natirsî, ka here li halê şivanê xwe binihêre ka şivanê te ketiye ci halî, dest û lingê wî tev qelişine, bûne bîrîn, nikare li pey pez here û rabe yekî bisîne dewsa wî, bila ew were vir, em lingê wî derman bikin, heyâ sax dibê."

BERHEVKAR: SERVET YÜKSELİR



Li navendê çandê çalakiyên vê hefteyê
Li NÇM'ya Stenbolê

● 27.08.1997 Yekşem:

Ji Teatra Jiyana Nû şanoya "Rojbaş", saet: 14.30

Konsera Xanemîr, saet: 18.00 (Hozan Xanemîr di vê konserê de wê hinek stranên gelêrî ū şoreşgerî ji kaseta xwe ya ku wê derkeve jî pêşkêş bike.)

● 01.08. 1997 û:

Ji beşa Sînemayê ya NÇM'ê Filmê Ömer Kavur "Anayurt Oteli",

saet: 18.00 (Ev film dema ku cara yekemîn hatibû pêşkêşkirin bûbû sedema gelek nîqaşan, lewre ev yekemîn filmê tirk bû ku li ser derûniya mirovan radiwestiya.)

● 02.08.1997 Şemî:

Ji Teatra Jiyana Nû lîstika "Rojbaş", saet: 14.30

(Lîstika Rojbaş bi berfirehî li ser jiyan û arîşeyen civaka kurd û hişyarbûna neteweyî radiweste.)

Belgefîlmî İsmail Beşikçi, derhêner Ahmet Soner, saet: 18.00

Pêşangeha zarokê Navenda Çanda Mezopotamyayê didome

AWIR

Mîtingê Kurdistanê an mîtingê Rojhilat



Roja 18.7.1997'an li NÇM'ya Izmirê sempozyûmek bi navê 'Mîtingê Kurdistanê' ji aliye zimanzan F. Huseyin Sağrıç ve hate lidarxistin.

Zimanzan F. Huseyin Sağrıç mîtingê ku di dema 1967'an de hatibûn lidarxistin, ji aliye ronakbîr û ciwanê kurd ve bi navê "Kurdistan mîtingerî" destrişan kir. Lewre ew mîting ji aliye ronakbîr û raya giştî ve wekî "Mîtingê Rojhilatê" tê zanîn ji van ronakbîrê hilbijartê İsmail Beşikçi jî pirtûkek bi navê "Dahûrîna Mîtingê Rojhilatê" "Doğu mitingerinin analizi" nivisiye. Lewre li ser pirsa me, 'çima hûn ji wan re dibêjin mîtingê Kurdistanê', birêz Sağrıç gotina xwe domand û bersiva pirsa me di gelemseyê de hişt.

Sağrıç di berdewama axaftina xwe de daxuyand ku di sala 1967'an de 8 mîting hatine lidarxistin, ji van 7 mîtingan ji aliye kurdistaniyan, ya din jî ji dorhêlê Rojhilat ve li Erzeromê bi navê "Mîtingê Sérhildana Anatoliyê" hatiye lidarxistin. Sağrıç wekî sedema mîtingê ev xal rêt kirin:

Dihat westin ku nîvê elektrîka Bendeva Kebanê li Kurdistan û nîvê din jî wê biçûya Rojavayê Tirkîyeyê. Li Batmanê rafinerî avakirina rafineriyekê dihat xwestin, ji bo ku petrôla xam li wê derê bê paqikirin. Lî dewletê rafinerî li vir ava nekir. Ger rafinerî li Batmanê bida-meziyîa wê gelek kesen kurd jê istifade bikiranî.

Yek jî hevalbendê Tûrkî, Nihal Adsız der barê nijadperestiyê de nêrinê

xwe anîbûn ziman, li gorî Nihal Adsız, ji bo nîjada tirk pak bibe, divê reh û koka gelê kurd ji holê bê rakirin, kurdan li hemberî van gotinan reaksiyon nişan dan.

Sağrıç, axaftina xwe wiha domand: "Di sala 1961'ê de TIP (Partiya Karkeren Tirk) damezîrî, di nav de gelek ronakbîrê kurd cih girtin. Mînak Musa Anter yek ji van bû." Birêz Sağrıç da zanîn ku mîtingê ku pêk dihatin di navbêra wan de heyetek hebû. Her wiha Sağrıç, da zanîn ku mîtinga dijber, li Erzeromê hat lidarxistin, lê bersiva wê jî li Enqereyê hâte dayîn. Bi vê mebestê 8 mîting hatin lidarxistin û di wê demê de li ser kîşeyâ kurd nedihat rawestin.

Sağrıç ji bo girtina TIP'ê (1972) wekî sedema sereke daxwazên ronakbîrê kurd nîşan da. Dû re ronakbîrê kurd di nav DDKO'yê de cih girtin û bi serê xwe parastina neteweya xwe kirin. Mînak: Beşikçi jî der barê vê bûyerê de wiha gotibû: "Kurd hatine ku neteweya xwe biparêzin." Sağrıç di dawîya axaftina xwe de dirûşmeyen ku wê demê hatibûn avetiñ wiha rêt kirin:

- Em ne qereqolan, dibistanan dixwazin
- Ne cendirmeyan mamosteyan dixwazin
- Çima ji Rojava re şaristanî, ji Rojhilat re cahîlî?
- Ne dipçik, em dest dixwazin
- Ne jî hev vejetinê, em yekîtiyê dixwazin

FEREÇ ÇOBANOĞLU

TÎŞK

ŞÜKRÜ GÜLMÜŞ



Mirin diya te bimire

İnsan, tim û tim ji mirinê tırsiyaye, bi jîneke nû kefxweş û dilşâ bûye. Ew taybetiyeke însanî ye. Mirin, rûreş, bextreş, bêtam, kitimiyeke mezin e. Jiyan; zêdebûn e, tameke ezîz e. Bereketekê bê buha ye, ji bo wê yekê însan, ji mirinê ditirse, direve û pê kefxweş nabe. Li ser jiyanê gelek tişten xweş hene. Li ser mirinê jî pir nîfîrîn dil bikul, dilbirîn ên dayikan hene. Yek ji wan jî "mirin diya te bimire" ye. Erê, bila dayika mirinê jî bimire. Bila ew jî sêwî bimîne. Bê dayikî bê bihuştî ye. Hem li vê dinê, hem li wê dinê (!).

Lewre mirov, însan çiqas egît be, çiqas dewlemend be, dîsa jî ji destê mirinê nikare bireve. Çend gotinê feylezofan, şoreşgeran li ser jiyanê û mirinê wiha ne:

"Her jiyanekî nû, ji mirinê re merhebayek e"

"Em ji mirinê natîrsin. Heya ku jiyan hebe, mirin tune. Gava ku mirin were, em tunene."

"Mirin, heye wekî perê çivîkan sivik e. Mirin heye mîna çiyayê Taye giran e."

"Mirin, ne ji bo mirovîn mirî, ji bo însanîn mayî felaketeke mezin e."

Ü wîha hîna pir dom dike. Em dikarin hîn jî wan mîsalân delal zêde bikin. Lî belê ez dibêjim, bila çend wekok (mînak) di cihê xwe de bimînin. "Ew besî me, hemûyan e. Ku mirov karibe ibretékî jê derxîne, yek jî bes e."

Ji bo vê yekê, wî însanî delal, enternasyonalîstê mezin Kemal Pîr wiha digot: "Ez ew qas ji jiyanê hêz dikim ku, ji bo wê ez dikarim bimirim. Em qebûl bikin an jî nekin, mirin û jiyan bi hev re tê dinê. Mîna bercêwiyan in. Ne bi iradeya me çêdibe, ne jî ji holê radibe. Însan di nav wan derecayan de, dikare ji xwe re fersendina bi dest bixe. Ji bo wê yekê xebatê min ên li zindanan hemû li ser mirin û jiyanekî nû hatine holê. Ez dikarim bibêjim ku, 'ewladê min i yekem û kitim' Şeva Çaran e. Mijara wê 'wekî pir însan zanîn' li se mirina Çar Egîdan el... Ên din jî ez dikarim wiha bînim ziman:

Tîrsa min, mîna sihya min

Merheba Mirin

Li ser Xeyalê

Rojek bi rûmet bedelî emrekî bê rûmet e.

Her wiha dom dike ew mînak. Mijara wan hemûyan; mirin û jiyan, tîrsedan, jiyanekî nû ye. Tişte taybetin. Li Akademiya Kurdi, qîzeke kurd, çavşîn, porzérîn, ji min pîrsî: "Xebatê we yê bi zimanê kurdî hene an na?.. min serê xwe xwar kir. "Li min biborin, lê heta iro min tim û tim bi zimanê tirkî nîyîsand. Lî eze bi zimanê xwe binîyîsim." "Navê xebata we ci ye?" Bê teredût û bê tîrs min bersiva wê da: "Mirin diya te bimire!.."

Her ser e

Vê dinyayê
 Dema cihê xwe, nas kir
 Kirasek ji
 Hemû rengan' pekhatî
 Bq bejna xwe ker kir û dirû
 Sal hatin
 Sal borîn,
 Mirovan xwe lê kire wêris,
 Kirasê ew pê razî ji ber kîrin
 Reng anîn û reng birin
 Ji reşeke tarî dest pê kîrin
 Ji ber kê ve
 Zilm û zilmatê
 Dinya nixafit,
 Ji hîngê were
 Mirova sera
 Renga çeng û ser e
 Li wan dinya
 Rise û heta iro
 Ci ne li bere

Hewar.. Hewar

Kê dîtiye
 Yan rojekê
 Ji gotinbêjekî bihîstiye
 Mirovên
 Ji ber pariyek nanî
 Leş û goşt
 Lê bûye hestî
 Dayika zarokê
 bi héviya
 Ji ber bîrsityê ne nivistî
 Wan bi xwe
 kirine hewar.. hewar
 Deşt û biyabanêt
 Dirêj birîn aqar.. aqar
 Mîrê mirova
 Hîngê, ji pêkenîna
 Di xindiqî
 Bi mest û serxustî
 Harîkarî.. bi rê kîrin
 Lê hezzî caran cihê daxê
 Li şîna
 Nan û derman û avê
 Bi sedan
 Rengêt gula digel xwe birin

Man xewn

Ne bi carekê hezar caran
 Viyan girê çar çira vemîrnîn
 Xemla bîhara gihiştî,
 Li govendî bişewtînin
 Pirtûka Zîn û Memê bidirînin
 Kela Xanê Lepzerîn avakîrî
 Ji bin bibin û biherifînin
 Lê bizütê Nêwtrozê
 Nehîstîn û qet, venekir



Xwezî û xewnêt nehezan
 Her man jehr û nebûn şekir

Min jîvan e

Dayê te digot
 Hêsta çilkêt te
 Bi dîmahî nehatibûn
 Çaxê gundê me
 Bi hovîtî wêran kîrin,
 Demek kêm mabû
 Rabû westîka û ser piya
 Landika me tu tê da
 Dinivandî
 Pelîxandin jêk pijiya
 Rast e dayê
 Ya te gotî
 Bi çavê serê xwe min dîtin,
 Her cihekî tê da bûrîm
 Min ajotî
 Nemabû bîhustek axê,
 Bo kêlan û cotî
 Li wan min jivan e
 Dî gel te dayê
 Heta heme ji bîr nakim
 Ya min dîtî û ya te ji min ra gotî

Di hev du dihelingivin

Ez zarok bûm
 Bîra min têt
 Weki niha,
 Faze min disîya xêwna vegêrim

Dema pîrekî
 Digot çawan peya
 Dibîne siyar
 Li wê demê
 Dest pê kir û
 Rikêb ketibûn bin piya
 Carekê ketibûn
 Hemûya çepil bo lêdan
 Digotin siyar
 Nabîne siyar
 Heta çend cara nekevin
 Cara siyaret me
 Li jordaniyêt revêk
 Hesp lê disetimin
 Lê nexweziyêt evro
 Hespêt siyara
 Bi xwe di hev du dihelingivin
 pêk ra ji ber êk du
 Di ketîne û neşen biliwin

Bextê te me nebêje min

Nebêje min dîlberê
 Ka hozanêt
 Te bi vîna min û xwe
 Vehandî,
 Nebêje min dîlberê
 Ka awazêt
 Pê digirnijîm
 Nahêñ xwendin

Nebêje min dîlberê
 Kanê tu,
 Dûr î ji min
 Tovê xweziya
 Cara me dihavêt
 Îdî nahêt çandin
 Bextê te me nebêje min
 Her gotineke tu bibêji
 Ne ji duhî, ne ji pêr
 Ji roja ji te peyda bûm
 Kovanêt vîna min û te
 Hatin nivîsin,
 Li nav dilê min
 Li nav hizra min
 Hatin nivîsin,
 Li nav keser û axînêt min
 Li nav kerb û kîna min
 Li nav bişkuj û bişkurîna
 Vîna min,
 Hatin nivîsin
 Li nav hebûna jiyanâ min
 Parçek im ji te
 Qet cuda nabîm
 Di xeyam û hişê min dâ
 Çend vîna me, kevnar dibe
 Pir dibe,
 Deh qat û deh qat
 Rihêt eşîqa min û te
 Li cihê xwe kûr dibe.

Mozaîka Çandı ARDES “Kardeş Türküler KÜLER”

Roj bi roj kasetê bi naveroka internasionalî zêde dibin. Kasetek ji wan “Kardeş Türküler (Stranên Bira) ji aliye BGST “Boğaziçi Gösteri Sanatları Topluluğu (Koma Hunerên Pêşanderî ya Boğaziçi)” ve hatiye amadekirin û li tomargeha (studyo) Kalan Müzik hatiye tomarkirin.

Naveroka kasetê li gorî navê wê ye. Di kasetê de ji gelek zimanian stran hatine gotin. Wexta ku mirov li kasetê guhdarî dike, mirov bi cihêrengiya wê dihese.

Çekirina muzikê ne karekî hêsan e. Ji bo berhemeke baş û kemîl xebat divê. Tê xuyan ku koma navborî jî bi çavê karekî hêsan li amadekirina kasetta xwe nenêrtine.

Kaseta ji aliye cihêrengiya muzikê ve baş hatiye honandin. Ji gelek zimanian di kasetê de stran cih girtine. Di vê xebata kolektif de bi kurdi (kurmancî, zazakî, tirkî, ermenkî, gurcîkî stran hene. Ji kurdên alewî strana semahê hatiye berhevkirin. Ev yek jî mozaîka çandî nîşan dide û li Tirkiyeyê xebatê bi vî rengî nêzîkatîya netewyan bi riya muzikê pêk tîne û li ser wê esasê biratiya gelan xurt dibe.

Kaseta vê komê ya yekemîn di sala 1996'an de bi navê “Hordosan–Azerî şarkıları” derketibû û solistiya wê kasetê jî Feryal Önay kiribû. Di wê kaseta yekemîn de stranê azerî cih girtibûn.



“Boğaziçi Gösteri Sanatları Topluluğu”

Belê derketina kasetê bi vî rengî divê hê zêtet bibin. Biratiya gelan, internasionalî, mozaîka çandî û xebata kolektif ya muzikî, em bawer in ku wê li Tirkiyeyê pêsiya hin tiştan vekin.

Stranen ku di kasetê de cih girtine: Burcak Tarlası, Demmê, Yandı Bağrım, Sökün, Dûzgûn Bawo, Fadikê, Jîn û Hebûn, Goranî, Sari Gyalin, Zepür gi Tarnam, Satrپalo, Golas Empula Yulun.

SERWÎSA ÇANDÊ

Sol û kitêb

JAN DOST



Hün bawer dikin, nakin kîfa we ye, min bi guhêñ xwe ev diyalog bihîst û wekî ku min bihîstiye, min nivîsandiye jî, erê hinekî seyr û ecêb e, her kes bawer nake sol bipeyivin, lê min peyva solan jî bihîst. Kitêbxaneyek û firoşgeheke solan di rex hev de hebûn li Helebê. Rojekê (şev bû) ez di navbera herdulan de rawestiyam û min jî xwe re hem li navên pirtûkan dînihêri û hem jî li model û buhayêñ solan dînihêri. Di nav xirecira sûkê de, dengekî pelixî bi ber guhê min ket. Ci binêrim!! Carekê min dît soleke poz tûj, bi qeytan di refika camekê de diheje.. ronahiya çirayêñ camekê ew ji rûyê artîstekê spehîtir kiribû. Berê solê ketibû kitêbeke di cameka kitêbxaneyê de. Sol û kitêb ketibûn vê diyalogê:

– Evar baş kitêb ê

– Evar baş solê.. Ci ez anîme bîra te?
– We.. ne em cîranêñ hev du ne,!! Min jî bala xwe dayê.
– Min dît ku tu ne bi kîf î û min xwest ez sohbetekê bi te re deynim!
– Çawa ezê bi kîf bîm? Bûye salek ez ji çapxaneyê derketime û li ser vê refikê razayî me, kesî hay ji min nîn e, toz li ser min bûye rûpelek. Kanî kîf ji ku tê?..
– Bi Xwedê yê min ez nû duh ji fabrikî hatime, ez ditirsim ez jî wekî te salekê bîmînim, bi Xwedê ezê birizim
– Na na, netirse, bi hezaran ling li hêviya te hene
– Tu çawa zanî
– Ho, hî.. ma ne ez tevde zanebûn im, berî te bi hezaran sol li şûna te rûniştin. Sê rojan nediman dicûn, piştre min ew di lingê xelkê de diditîn.
– Baş e çîma tu·ji cihekî xwe nalîvî, ma kirîdarêñ (muşteriyê) te nîn in?
– Ez ji bo mejiyan im, ne ji bo lingan im, niha xelk bi lingê xwe difikirin. Meji bûye şivanê xeyalan, bi kîrî xewnan tenê tê. Ji xwe yê ku min dinivîsin dîn in.. ew dizanin kes min naxwîne, çîma min dinivîsin? Ew ji xwe re bibin koşkar'ne çêtir e?

Nûbihara nû derket

Kovara mehane Nûbihar, bi hejmara xwe ya 53-54'an derket pêşberî xwendevanê xwe. Wekî hejmara berê, vê ca-re jî kovar bi derengî maye, lewre jî du hejmar bi hev re derkette. Di pêşgotina kovarê de xwesteka pirbûn û zêdebûna xwendin û xwendevan, bi demê ve tê girêdan û wiha tê gotin: “Çawa ji bo pijandina xwarinekê wext lazim e, çawa ku ji bona mezinbûna dergûşekê dem lazim e, her wisa ji bona pirbûn û zêdebûna xwendin û xwendevan jî zeman û xebat lazim e.”

Her wekî hejmaren berê di vê hejmarê de jî Alî Karadeniz, bi sernavê ‘Azadî û mirov’ nivîsa sereke nivîsandiye. Di vê nivîsa xwe de nivîskar, balê dikişîne ser “azadiyeke çawa” û pêdivîyên azadiya rastin.

Di gel gotara Alî Karadeniz, di vê hejmarê de Sabah Kara, Mûhammed İqbal, Baba Tahirê Uryan û Mela Hesen bi helbesten xwe cih digirin. Bi sernavê

‘Şeva havînê’ Raserîn Baravî çîrokeke Ahmet Hamdi Tanpinar ji zimanê tirkî wergerandiye zimanê kurdî. Her wiha Ferid Izolî bi nivîseke zazakî ku ji “Reçeteyen İctîmaî” ya Bedîuzzeman Seîdê Nûrsî süd û kelk wergirtiye, Rojîn Zelal bi nivîsa “Peyvîn Kurd-arî yêñ di zimanê tirkî de” rîzenivîsa xwe didomîne. Nivîsa Ahmed Înan bi navê “Bi Qûranê qîmkirin” ku beşek ji teza mastera wî ye balê dikişîne ser xwe.

Mîna her car rûpela zarokan “Zarokname” dîsa ji hêla Xelîl Amed, astana pirtûkan jî, ji hêla Ercan Gür ve hatiye amadekirin.

SERWÎSA ÇANDÊ

Di fabrikîyê we de kar bikin ne çêtir e. Xwe jî diwestînin, te jî diwestînin, baweriya te bi Xwedê heye, sola delalî kurm ketîne me, em êdî nema...

Hîn gotina pirtûkê negîhabû dawî, di pişt carekê re destê firoşkar (ayî) dirêjî sole bûn, ew ji ser refikê daxistin. Dengê wê kûr dihat (bi xatirê te... bi xatirê te..) Pirtûk li cihê xwe ma û bi çavêñ tijî kîn giriya.. Kêlikêk di wê navê de çû.. ew sal di lingê yekî de bû û bi pozbilindî ew diajot û qîrp qîrp ji erdê dianî.

Belki xwendevan bawer nekin vê bûyera ku bi min re ciriyate... lê ezê bînivîsim û ew dîsa bi kîfa xwe ne: Berî ku ez vî quncikî temam bikim, hate bîra min ku min pêşgotina çapa duyemîn ya Mem û Zîn a erebî rê kiriye Şamê, min xwest ku ez fêm bikim ka gîhiştiye yan na, min telefon da bûroya ku pêşgotin jê rê hatiye birêkirin. Keçikê bersiva min neda û got: Deqeyekê li ser telefonê bîmîne emê lê bigerin. Ez bê deng mâm, lê guhêñ min li ser bihîstokê bûn.. Yekî din telefon ji wê keçikê re vekir û wî got: “Min çend cöt sol di pasa we de ji bîr kirine, hêvidar im hûn lê bigerin...!!

Leşkeriya gundiye kî

Jî gundekî Kurdistanê gundiye kî diçe leşkeriyê. Gava leşkeriya wî xelas dibe, vedigere tê gundê xwe. Ji ber ku gundiye kî Kurdistanê bi tirkî nizanin ev zilamê hanê xwe qure dike. Çend hevok tirkî hîn bûye. Li ber dilê wî hînbûna tirkî, tiştekî pir baş e, mirov pê mezin dibe.

Bi hînbûna tirkî qure bûbû. Gundian jî meraq dikir, digot 'gelo ev zilamê hanê bûye çi.' Rutbeya wî çi bûye. Bavê wî jî, bapîrê wî jî merak dikirin. ïn wî xwe qure dikir û meraqa nava dilê gundiyan zêde dikir.

Rojekê bavê wî û bapîrê wî, wî dikîşinin quncikê menzelê jê dipirsin.

- Kuro te li leşkeriyê çi kar dikir?
- Kerekî bi qîmet
- Kuro tu onbaşî bûy?
- Daha mezintir
- Tu çavûş bûyî?
- Daha mezintir
- Belqitiyo te em di meraqan de kuştin de bêje tu çi bûyî?
- Tiştekî mezin, tiştekî mezin
- Kuro, qey tu yuzbaşî bûy
- Ka yuzbaşî ji tiştek e
- Nebî! tiştek daha mezin
- Erê tiştekî daha mezin
- Kuro emirqu, qey tu bînbaşî bûy
- De min aciz nekin. Ez dibêjim tiştekî mezin. Hûn bi dû çavuştî, bînbaşî-

tiyê ketine.

Bavê wî û bapîrê wî dinihêrin ew tiştekî nabêje dev jê berdidin.

Diçin odaya gund. Li odaya gund ciyat rûniştiye. Bavê wî ji civata hazır re dibêje, ev belqitiyê min, em dikin nakin ji me re nabêje li leşkeriyê çi kar kiriye. Ji civatê dixwaze, alîkariya wî bi-



kin. Ka çawa karê lawê wî hîn bibin.

Her kes li gorî xwe tiştekî dibêje. Di dawiya dawî de dibêjin. Kar dikeve ser milê bûka te yanê jina lawik. Gava hûn çûn malê ji bûka xwe re bibêjin, gava raza bila wî hişyar bike jê bipirse. Belkî gêjî xewê be, bêhemdê xwe bersiv bide. Ev raman dikeve serê bavê lawik.

Gava vedigerin malê her tişti ji bûka xwe re dibêje. Bûka wî jî dibêje: "Bavê bila be, ezê vê fenê bînim serê wî."

Şev derbas bû êdi dema razanê hati bû. Lawik tevî jina xwe diçe odaya xwe û radizên. Bûk dînihêre ku lawik dîxew re çû.

Radibe ser piyan û bang li lawik (mîrê xwe) dike.

- Kalk asker kalk (rabe asker rabe)
- Himm, himm ne neee
- Kalk nöbete, (rabe nobetê rabe)
- Tabakçıye nobet yok..... (ji firaqşen nobet tune)

Li ser vê bûyerê jinik tiştekî nabêje hetanî şeveqê disekine. Şeveqê tê bûye ra ku derbas bûye ji xezûrê xwe (bavê lawik) re vedibêje.

Bavê lawik wekî ku haya wî ji tiştekî tunebe, li ser taşte (xwarina şeveqê) ji kurê xwe dipirse.

- Lawo min meraq kir.
- Bavo te çi meraq kir.
- Li leşkeriyê rûtbeya (paye) tabakçî zêde ye, an a bînbaşî

Bapîrê lawik dikeve nava xeberda-nê, dibêje, hîn tu bi vê jî nizanî, firaqşen li ku, bînbaşî li ku. Ji bo tu bîbî firaqşen pêwest e tu çar sal binbaşîtyê bikî.

BERHEVKAR: BADÎN POLAT

XACEPIRSA BIXELAT (78)

XACEPIRSA

Berokz İndeksi Kurdî (wêne)	Berçungs peşez Gall xwero	L	Güllanekî Seri	Ü	TTC İdevenek Dîberen	Q	Meweyek Dîber	T	Tipka
15	E R O K	K	Düremant ku hîzî dîber minow	H E R I M					
Fîneler	F E S A D	A D	Dîberî hîzî Kurbatîkî hîzî hîzî	T E R					
Gündelik Mest	T I S	S O	5	Heyf.	Q I M				
Kewîn Bî cîrî kur	K E L E P I R	I R			Senabîde Argone	1			
Bî inellî cur	B N	T I R	Pîst Pîst	B A R					
E Y E	E G A L								
Erol... Çekir	A N A R	S I	Nutayek						
Ü Z I	E S A N								
PEYVA VESARI									

Bersiva Xacepirsa 76'an

Xacepirsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigîhîjin me, emê wan-binîxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 78'an pirtû-ka (Ziwanê ma)


Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Vesarı" di nava quityen li bin xacepirse de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînîn.




Pênc kesen ku xelata xacepirsa hejmara 76'an kaseta Ciwan Haco (Bilura min) qezenc kirine. Halîl Katar/ Mêrdîn, Hasan Saya/ Semsûr, Y. Doğan Özbay/ Bazîd, Zelal Odabaş/ Amed, Brahim Xelîl/ Amed

Berokz İndeksi Kurdî (wêne)	Zekiye... Hejmarek	Veqetanda kek Rastin	Mam Agîrin	Tevlihevi (berepaş) Guhartîn	(berepaş) Sembola radonê
Raste rast				1	Kal Mane
Metal					
				(berepaş) Nexwaşînek	
				Derew	
Endam	Kerîyek nan				Sembola kukurtê
	Peyîvi				
		Qertafa raweya fermanî		Mobilyayek	Nexwaşînek
Li nav gola Wanê ye Bi tirkî bireweri				5	
	Xak			Sembola argonê (berepaş) na	Bî tirkî küçük
Awa					
Oksijen				Pasgirek	3
	Xînizi	6			

PEYVA VESARI





Cerdevan:

Dewleta tirk me dike hedef

Li seranserî Kurdistanê, bi taybeñi jî li derdora Wan û Culemêrgê çalakiyên gerîla zêde bûn. Li herêma navborî gerîla bi qasî ku berê xwe didin hêzên dewlet, bi ser cerdevanan de jî dice. Her wiha berî cend hefteyan li ser **banga çekberdanê** ya ARGK'ê gelek cerdevan jî çekên xwe dafinin, HEVALÊ ME ELBAKÎ li vê herêmê cend nûcâyên balkes li ser cerdevanan amade kirine, ew nûcê bi awayekî baş rewşê diyar dikan.

Dewleta tirk cerdevanan dike hedef

Ji Wanê heta Geverê li serê girik û çiyan bi sedan kolik (kozik) balê dikisiñin. Li ser her kolikê jî ala tirkani li ba dibe. Ev kolik ji bo cerdevanan hatine çêkirin, da ku ew xwe tê de biparêzin. Di navbera Xoşab û Elbakê de li Gozelderey li ber devê rê kaniyek heye, li hêzîki vê kaniyê jî kolikek heye. Berî vê demekê em li ser kaniyê ji erebeya xwe peya bûn da ku avê vexwin. Du heb jî cerdevan hatin me bi wan re kurtehevpeyvînek çêkir.

Hûn xelkê ku ne?

– Abê em xelkê Xoşebê ne.

Hûn çima bûne qorîci?

– Valahî kî me dibîne vê pirsê ji me dike, xûlasa meseleke kûr û dûr e. Bi rastî bi zora dewletê em bûn qorîci. Gotin “an hûnê bibin qorîci, an jî emê gundê we bişewitînin, we koçber bikin.”

Koçberî ji şerê birakuijîye ne çêtir e? Navê te çi ye?

– Mahmûd e. Abê ez nizanim hûn kî ne, lê wê jî baş bizinan, wî zemanî nan di devê

şeran de bû, min nedikarî li bajîr biçûkên xwe xwedî bikira, lê niha nêzîki 20 milyonî distinim, 2 milyonan didim qoricebaş, 18 milyonan ji min re dimîn.

Heya niha get tu ketî ser?

– Pir caran em birin operasyonê, du rojan berî niha jî kolika me dan ber roketan, lê em tê de nebûn, çi li (tiştek bi) me nehat. Çawa dizanîn ku ev kolika we ye?

– Mala te ava be, hemû kes jî dizane ku ev kolika me ye. Ma tu vê ala ber kolikê na-bîn?

Dewletê hûn nekirine hedef?

– Wele vê (wisa) ye, di operasyonan de em li pêşiyê dimeşin, nobetê em digirin, lê leşker di kolikê binerd de nobetê digirin, me cend caran itiraz kir jî ev al ji ber pozê me ranekirin.

Dawî wê çawa be?

– Ci zanim, herhal ne xweş e. Bi rastî hûn kî ne, çima van pirsan dikan?

Em rîwi ne, me tu carî qorîci nedîtibûn, me meraq diktîr ka hûn çawa ne.

– Wele hûn dibînin ka em bi ci awayînan qezenc dikan, lê kurd hesûd in, hez na-kin em keriyek nan bixwin, ji me re dibêjin caş, xayîn...

Li Wanê rewşa Şîmşekan

Piştî ku par (1996) li Wanê çeteyleke komike cerdevanan bi navê “Şîmşek” ji aliye leşkeriyê ve hate damezirandin, karêne kirêt li herêmê zêdetir bûn. Ew çete carinan kincen gerîla li xwe dikin, êrişê dibin ser hinek gun-dên Elbakê mîna Paçan, Çux, Gundşêx, Eringanî û yên din. Dizi, şêlandin, zordarî karê wan e, endamên çeteyle diavêjin ser malen welatparêzan zilmê li wan dikin. Li ku derê operasyon hebe ew didin pêşîya polis û leşke-

ran.

Serokê wan Şaban Kahraman e û ji eşîra Alan e. Piraniya cerdevanan jî ji vê eşîre ne û hejmara wan li dora 700 kesi ye. Çalakiyên wan ên kirêt rika gerilayen kişand ser eşîra Alan û cerd û êrişen gerilayen li ser wan zêde bûn. Di du mehêne borî de ji wan 30 heb hatin kuştin, ew qas jî birîndar bûn. Di hemû çalakiyân de Koma Şîmşekan li hemberî gerîla tek diçin, lê disa jî dev ji çabîşitîyê bernadin. Van rojên dawîn jî 2 heb ji wan hatin kuştin û destvala zivirîn. Piştî van bûyeran hinek cerdevanan Şaban Kahraman ji xesaran berpîrs girtin û hinek jînîn cerdevanan bi keviran êriş birin ser mala wî. Ev kom hî karê xwe yên kirêt didomîne.

Nahelen kesen ku dev ji cerdevaniyê berdane bikevin Wanê

Di 10'ê berfanbara 1995'an de heftê malbatan ji Ertoşa (Uzundere) Çelê dev ji cerdevaniyê berdabûn. Hinekan ji wan (30 mal) koçî Wanê kiribûn, 40 malbat jî çûbûn li gelîyê Makitanê ya Culemêrgê di kon û kolikan de dijin. Serokê Belediyê û Serokcerdevanê berê Şaban Alkan û birayê Cuma Alkan gef li wan dixwarin, giliyên wan li ba hêzên dewletê dikirin. Li ser vê yekê koçber ji nû ve ketin rî û içar berê xwe dan Wanê. Roja 22'ye tirmehê polis û leşkeran riya wan birî. Wali û midûrê emnîyetê ji wan xwestin ku vegerin gund û ji nû ve bibin cerdevan. Lî berpîrê koçberan Kasım Korkmaz got: “Em bimirin jî, em venagerin”, piştî re jî gel bi sloganan ber bi Wanê meşîyan. Li sér vê yekê polisan êriş bir ser gel, kesen ku bi destê wan ketin xistin û gel ji hev belav kirin. Di vê êrişê de jinek birîndar bû û ew rakirin Newxeşxaneya Wanê.

Ferhengok

ewletî: emniyet (güvenlik)

eger: sedem, hoy

ezmûnerî: tecrübe (deneysel)

gengesekirin: gotübêkirin, nîqaşkirin

hawîrparêz: keskparêz, derdorparêz

hevpar: hevbes, pişkar, müşterek

heyam: serdem (dönem)

hilteqandin: hilfirandin (havaya uçurmak)

jîmar: nûmera, miktar

karmend: memûr, xebatkar

kolik: gir, kozik

landik: dergüş

mafî çarenûse: qedera xwe tayinkirin

maweya navîncî: orta vadede

mîsogerkirin: garanûkirin

nermerê: rînem (ilümlü)

nîmandin: temsîkirin

pergal: sazûman, sistem

peywendi: têkilî, danûstandın (ilişki)

pêşdarazî: pêşînhikûm (ön yargı)

raye: otorite (yetki)

resenî: xwerûti, orjinalî

rex: cem, ba, kêlek, nik

teqemenî: tişte-ku diteqe (patlayıcı)

teklîdar: eleğedîr

tomarkirin: qeydkirin

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayincılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMÎ TAN

Berpîrê Karê
Nîvîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHIR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.S.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTYÎN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî
yê Ewrûpâye:
Mazhar Günbat

Tel: 00 32
53 64 12 62

Brûksel

Medenî Ferho

Suriye:

Jan Dost

Helîm Yûsiv

Berlin:

Silêman Sido

49-30-69002695

Hannover:

Selîm Biçûk

49-5721-81360

Munchen:

Mahmut Gergerli

49-871-670884

Stockholm:

Robîn Rewşen


46-8-7510564

Bonn:

Ahmet Baraçkılıç

49 228 66 62 49

amojarî: şiret, pend; pedagoji
arişê: kese, pirşirêk, problem
berevanî: parastin, berhingarî (savunma)
berî zayînê: berî mîlâtê
bêhempa: bêemsal, yekta
bihîstok: ahîzeya telefonê
bîrstî: birçîtî
bizot: sersot (köz)
cerd: avêtina ser (baskın)
cîhêring: xweser, (özgün)
cur bi cure: celeb bi celeb
çalak: bi tevger, aktif
dirustkirin: damezirandin, çêkirin.
diwaro: pêşeroj, ayende (gelecek)
firoşgeh: dikân



Malbata Zilanê:

Ji bo azadî û astînê xwefedayî pêwîstî e

Ew di saxiya xwe de ji rûmet û serbilindiyâ me bû. Pir bi kîf û ji dil bû. Têkiliyê wê ne sar û bi henekî bûn; germ û ji dil bûn. Ew wî çaxî ji roniya çavêne me bû û ji bo ku şexsiyeteke wisa ev çalakî ji pêk anîye ez pir kîfxweş im. Ji bo ku ez lêzimê şexsiyeteke wisa me, ez pir serbilind im.

Zaroktiya Zilanê çawa bû?

Zaroktiya wê pir xweş derbas nebû, bi taybetî ji aliye aborî ve. Dibistana seretayî li 3 bajaran li Meletî, li Sêwaz û salekê ji li Stenbole xwend. Yanî we zaroktiya xwe nejiya.

Têkiliyê wê yên di nav malê de çawa bû?

Ji zarakan pir hezdikir, bêyî ku ferqê têxe navbera zarakan ji her zarokî hez dikir û psikolojiya hest û ramanêñ insanan pir rast tahlîl dikir û fêm dikir. Hemû hebûn û nebûna xwe bi hevalên xwe ve par dikir, her tim dixwest ku bide, yanî destvekirî bû, merd bû. Ev taybetiya wê, ew bêhtir dilges dikir. Kompleks û hewesêñ (özenti) wê tunebûn.

Wê dibistana bi razîngîh (Haydarpaşa Meslek Lisesi) xwend, piştî ku ew xîlas kir, li Meletiyê di zanîngîhê de xwend em ji hev dûr bûn, ji ber wê ye kî ez nikarim pir tiştan bibêjim li ser hevaltiya wê ya di xortaniya wê de.

Kengî ket nav refîn gerîla?

Ji ber ku em ji hev dûr bûn, em pir ne agahdar bûn bê ka ci dike. Me digot qey ew zewiciye, lê piştî çûyîna wê bi salekê me bihîst ku ew bûye gerîla çûye çiyê. Yanî me di 1996'an de bihîst ku Zeyneb bûye gerîla.

Di 30'ê Pûsperê de ev livbazi pêk hatibû, gava ku we bihîst, hûn têgihîştin ku xwediyê wê livbaziye Zilan e, we his kir?

Belê min his kir. Ji ber ku ez her wê li nûçeyan temaşe dikim. Çawa ku

ez ketim hundir, nûçeyan dest pê kirin û nûçeya yekemin ev livbazi bû. Me vê ga-vê texmîn kir û me haziriyê xwe kirin û em ketin ser riya Meletiyê.

Hûn ji bo cenaze cûn Meletiyê ma-la diya Zilanê, ew roj çawa bû, hûn di-karin hinekî wê rojê bînîn ber çavêne me?

Em di şokê de bûn. Yeke ku pir nê-zîkî me ye û xwe daye vî tiştî û ev livbaziya mezin pêk anîye; em şok bûn. Ji ber ku heya wê gavê me nizanibû ew ci dike, çawa dike, ji nişka ve tiştîkî wilo em şok kiriñ. Şewîyan (telaş), xem, girî hemû bi hev re; heya çend rojan me tiştîkî nekir, em ji xwarin û vexwarinê qut bûbûn. Hin ji malbata wê ne welatparêz in. Livbaziya Zeynebê nedipejirandin, qebûl nedikirin. Fikra netekîyi bi wan re tune ye. Hem ji bo vê yekê rojnameyên tirk ên ku li diji kurdan bûn ji vê yekê sûd wergirtin. Li ser Zilanê nûçeyen dûrî rastiyê ni-vîsîn

Ev livbaziya xwefedayî ji bo rawes-tandina ser û pêkhatina aştiyê li gorî we xwediyê cih û wateyê ye?

Belê rast e. Ev çalakî ji vî aliyî ve pir girîng e. Ez ne li dijî vê fikrê me, ji bo ku xwîn bê sekindandin û ser bê rawes-tandin.

Yên ku dizanin hûn nêzîkî Zilan in, çawa li we dinêrin?

Yên ku politîk in, baş dinêrin, lê yên din baş nanêrin. Yanî pir-hindik ên ku ideolojiya welatpariziyê bi wan re he-ne, bêhtir germ û ji dil li me dinêrin, tê-

kiliyên wan ji dil in. Yê din herhal dibê-jin ku qey wê zerar bigîhêje wan û ji tir-sa dewletê ji me dûr disekinin.

Bi qasî ku hûn dizanin, têkiliyên Zilanê di nav malbatê de çawa bûn?

Ew di saxiya xwe de ji rûmet û serbilindiyâ me bû. Pir bi kîf û ji dil bû. Ez carekê nexwes ketim, nizanibû bê wê ji bo min ci bike. Têkiliyê wê ne sar û bi henekî bûn; germ û ji dil bûn. Ew wî çaxî ji roniya çavêne me bû û ji bo ku şexsiyeteke wisa û ev çalakî ji pêk anîye ez pir kîfxweş im. Ji bo ku ez lêzimê şexsiyeteke wisa me, ez pir serbilind im; yanî tenê ne ji bo ku ew lêzimê min e, lê ji bo kesayetiya wê û fêdeya wê ji bo mirovahîye ez gelekî serbilind im.

Di mesajek xwe de gotibû "xwezi di vê riye de ji bêyî canê xwe tiştî hebûya ku min bida?" Hûn wekî lêzimeke wê û jînekê çawa dinirxînîn vê mesajê?

Belê ev ji mirovahîye re mesajek e. Em dijîn lê çawa? Em tu tamê ji jiyana xwe nabînin. Lê Zilan têgîhiştiye ku ji bo ci diji, ji bo ci şer dike; dî van hemûyan de gîhiştiye. Yanî dibêje ez ci bidim hindik e.

Ji jînîn welatparêz re mesajên -we yên çawa hene?

Ez dibêjim em ci dikin? Yanî ji bo welatê xwe, ji bo mirovahîye em ci dikin?

Li Dêrsimê Zilan dest pê kir. Li Sê-wazê Bermal û li Edeneyê ji Rewşen riya wê meşandin. Ji bo ku TC ser rewes-tine hûn ci dibêjin ji TC'ê re?

Divê TC di demeke zûtirîn de şer beskinîne, bes xwînê birijîne, leşker, polîs, gerîla, yanî kî dibe bila bibe, me na-vê ku bêñ kustîn, xwîna wan birije. Ew dixwazin aşti çêbibe. Hêviya me di zûtirîn demê de aşti çêbe. Bila dê û bay-xwişk û birayêñ kesî, zar û zêcêñ kes-negirin. Em dixwazin pirsgirêk bi riye-siyasî û aştiyane bêñ çareserkirin.

Baş e ku TC nêzîkiyê li aştiyê neke-xwe li aşti û çareseriya siyasî negire, gorî we, çalakiyên intîxarî wê bibîn?

Girêdayî wê, girêdayî polîtîkay wê ye, tabî dibe ku bibe. Eger ku TC qedîlamân û hwd. dike û van kîrinêñ xwe-dewam bike û heqê kurdan nede wan divê livbaziyeñ intîxarî pêk bêñ.

Ji gele kurd re û ji gelên din re mesajen we ci ne?

Yen ku têkoşîna neteweyî dikim hemû karker û kedkarêñ dînyayê bila bigîhîjîn armanca xwe, yanî xwestekî min, têkoşîna bi hev re ya çîna karkerêñ dinê ye. Dînyayek bê şer, bê sîle! Serfi-riya hemû însanêñ bindest dixwazin têkoşîna ETA'yê ji li İspanyayê wekî têkoşîna me girîng e. Çimkî ew ji têkoşîne ñe dikin. Ew ji ji me re serbilindiyek e. Çimkî eyñ hest û ramanê ew ji ji vê têkoşîna me re his dikin.

Bi hemû hest û ramanê xwe, bi hemû tiştîn xwe, ez canê xwe ji datînî meydanê, ji bo serfiraziya vê têkoşîne ñe divê emê bikin.